# MEHKÛM

M. Ali Kut



# MEHKÛM

M. ALÎ KUT

# MEHKÛM

NOVEL

M. Alî Kut

WEŞANÊN WELAT

1994

**Weşan: 12**

**MEHKÛM**

**Çapa yekem**

© M. Alî Kut

Pergala berg û rûpelan: WW

Wêneyê berga pêşîn: E. Delacroix (1798 - 1863)

Çap: Li derveyî welêt

ISBN: 91 972197- 2-X

# NAVEROK

DILOP....9
MEHKÛM....13
EZ Û HEYKEL....27
KEÇIKA PIÇÛK....33
KEN....38
REŞBELEK....41
XEWNEKE ŞEVA ZIVISTANÊ....46
TERORÎST....54
SERÛPÊ....63
DILÊ DÊ....71
TABÛT....76
BAFILE....87
TIRŞIKÇÎ....94
TEYREK ZÊRÎN....104

*Mîrê Emgiónê*
*mîrekî kurd*
*Li Vlachemê girtî*
*Pêşkêşî agirê te dike vê axaftinê:*
*Dûşîza ku kesek ne xwedî ye*
*dûşîza ku ne xwediyê tişţekî ye*
*Ruhê min ji min re goti bû*
*ku ez ê li hemberî wan serî hildim*
*Ger ku serê min vê gavê*
*li ser darekî daçikandî li ber derî be jî*
*fikra min li ba te ye*
*Dûşîza ji Agir û ne ji Tişţekî (*)*

**Gunnar Ekelöf**

---

(*)Dîwan Li Ser Mîrê Emgiónê

# DILOP

Dipa! Tarîtî, şev dipa! Li benda avaçûna royê û tarîtiya şevê bû. Ji bo ku bikari be derkeve der doş bibe, hinek hewa paqij bikişîne cîgerê xwe ev pêwist bû, ango avaçûna royê û tarîtiya şevê...

Tenê tarîtiyê dikarî bû ew veşarta, ew ji ber çavan winda bikira da tu kesî ew nedîta...

Gelek caran li reşikê şevê dikir hawar da hinekî din şevê dirêj bike, ji bo ku bikanî ba xwe bigihanda şikefta xwe. Te digot qey carina reşikê şevê dengê wî dibihîst û teşiya xwe hêdî hêdî dirist û giloka şevê dom dikir, şev dirêj dibû; wê çaxê ew jî berî rojhilat digihişt cihê xwe...

Di şikefta xwe de, li ser cihê xwe dirêjkirî diramiya: Di ta-

rîtiya şikeftê de ronahî difikirî û di tenêtiya xwe de jî mirov... Li ser cihê xwe ramidandî dengê dilopên şikeftê dihatinê; şikeftê dilop dikir... li dilopan fikirî. Hinekî wisa domand fikirandina dilopan. Li xweşa wî diçû dengê wan. Dilopan ew ji heqîqetê bi dûr dixist, ew paşde vedigerandin rojên buhurî, zarotiya wî dihanîne bîrê...

Xilmaş bû, serê wî tewiya ser balgiha ku ji pûş çêkiri bû. Ev balgiha ji pûş nuha bû bû balgihek ji hirîyê û ruwek hîzar li ser bû, dora wê jî neqişandî bû. Doşeka wî bostekê ji erdê bilind bû, ew jî ji hirîyê bû; lihêfek ji hirîyê jî bi ser de kirî bû...

Nuha, li ser nivînên xwe ramedandî dengê dilopan dihatê. Dilopan digot: «Niqq... niq, niq...» Zivistan bû, belê zivistan bû wexta ku di nava nivînên xwe de ramedandî dengê dilopan dibihîst.

Wê şevê ji erd û ezman baran dibariya, ji ber vê jî xaniyê wan dilop dikir. Diya wî, firaxên ku di malê de hebûn tev danî bûn bin cihê ku dilop dikirin, tepsik, legan, tepsîn û teşt... Yek ji leganan jî danî bû ber serê wî, ji ber ku wê derê jî dilop dikir...

Li ser piştê vezilandî, li siryaqa xênî dinerî. Li beştên telomelo û mirdyaqên riziyayî, li pûşê ser mirdyaqan meyze dikir. Ji dixana agirê ku di hundurê malê de dibe tev reş bû bûn. Hinekî wisa li siryaqa xênî temaşe dikir. Bihar hate bîrê, zarokên hevalên xwe bi bîr dihanîn; dema ku tev de diçûne çolê, kereng diçinîn difikirî... Xweşiya biharê xeyal kir, wexta ku ji çîçekan tacek dirist û dida serê xwe... Pîvok dihatine bîrê: «Ew serikê wa yê sipî bê çiqas xweş bû!» Ji nişka va berxikê

xwe Kudik bi bîr dihanî. Bi lez dixwest ku vê fikrê ji serê xwe bavêje, lê xilmaş dibû, êdî di xew re diçû...

Çaxê biharê bû, genim seridî bûn. Wê rojê dîsa bi çend hevalên xwe re li ber berxikan bûn. Berxik li nava zeviyên nêzî xetê diçêrandin. Hayê wan ji bayê felekê tune bû. Berxik xwe serî xwe berda bûn û ji xwe re dileyistin, bi botika şivanan dilîstin. Botik ya wî bû, paçek li ser çavên wî girêdayî, bi vir û wir de dibeziya ku hevalekî xwe bigire. Dûre hevalekî xwe digirt. Destekî wî hêj bi kincê hevalê wî ve û bi destê din dikir ku paçê ser çavên xwe hilîne, ji nişkê ve qupîna tifingekê ew di cî de mat dihişt. Bi lez paç ji ser çavên xwe hiltanî û tevda li alîyê ku dengê tifingê jê hati bû dinêrîn! Leşkerê ku notirvanê xetê bû, berxikek wan î ku nêzîkî têlên xeta sînor bû bû, kuşti bû. Bi lez berxikên xwe yên din dicivandin û ji wê derê bi dûr diketin. Wî di tunebûna Kudikê xwe de zû derdixist. Kudikê wî li ser xetê hati bû kuştin, laşê wî li wir bû. Bi kelogirî riya malê digirt, baz dida...

Ji nişkê ve ji xew vediciniqî! Hinekan li deriyê mala wan dida. Ji dengên wan fam dikir ku romî ne. Ji nava nivînên xwe derdiket û diçû hişk bi dawa diya xwe digirt. Bavê wî radibû, diçû derî vedikir. Bi vekirina derî re, sê çar romî pevre diketin hundurê malê. Sisiyan ji wan mal saxtî dikirin û yek jî dihat ji bavê wî pirsa wî dikir, digot; «Ka! Lawê te li kû ye?...» Ew hîn bêtir ditirsiya û xwe di nava kirasê diya xwe de vedişart. Romiyan hundurê malê qul bi qul saxtî dikirin, dûre yekî ji wan ew di nava kirasê diya wî de keşif dikir û li romiyên din diqêriya, digot; «Werin! Va ye, min mehkûm zeft kir!...» Çawa ku teyrên mirara ji hewa xwe dadidin ser laşê heywanekî

mirî, romiyên li hundur jî hemûyan bi hev re wisa xwe dadidan ser wî! Yekî ji wan bi çeplê wî digirt, ew dikişand û yekî din jî destê xwe bilind dikir sîleyek li binguhê wî dixist...

Gava ku ji xew çemd bû, dît ku dilopek ji bin zikê şikeftê bi ser eniya wî de ketiye... Hinek ji ava dilopê herikî çavê wî, fena ku barût têkeve çavê wî, ji ava dilopê jenî...

# MEHKÛM

Rabû ser xwe, rûnişt, bi zendika xwe çavê xwe paqij kir. Ji bêrîka xwe heste derxist, vêxist û li saetê nerî; 3 nîşan dida. Hêj zû bû, ji avaçûna royê re gelek wext diva. Xwe bi xwe: «Çar pênc saetên din, di vir de ez ê çawa debar bikim?» got. Rastî jî wusa bû! Ne dihat debarkirin. Her ku wext derbas dibû jî, bîhna hundurê şikeftê genîtir dibû.

Wê rojê dengên ku nêzî şikeftê bihîsti bûn ew mecbûr kiri bû ku pêwistiyên xwe ên însanî jî di hundur de bike. Viya jî bîhnek tûj -zêdetir genî- li hundurê şikeftê belav dikir. Herçendî mîna pisinga ew bi axa hundur û keviran veşarti bû jî, dîsa ji xwe re rêyek didît û bîhna xwe ya tûj -genî- digihand qulên pozê wî.

Vê bîhnê êşek dijwar xisti bû serê wî, ew dewixandi bû, gêj kiri bû û her xewa wî dihanî. Mîna ku eva ne bes be, ramanên dijwar jî ji hêla xwe de, li pey hev êrîşî serî dikirin û nerehetî didanê. Lê ji neçarî ew diva bû li benda tarîtiyê bima. Nikanî bû dev ji şikefta xwe berda, ew şikefta ku keleh û sitara wî bû! Nikanî bû xwe şanî royê bikira, xwe nikanî bû bisiparta wê stêrka mezin ku qisûr û kêmasiyên tu kesî venedişart. Ji xwe ji vê hêlê de jî gotin jê re tune bû! Gelek caran wî xwe bi xwe digot: «Jiyana min bi qisûr û gunehan ve tijî bûye; lê ev guneh û qisûr hemî min li şexsê xwe bi xwe kiriye û eva bi salan min domandiye; ez li hemberî xwe gunehkar im!» û paşê jî dilê xwe bi xwe dişewutand û gazî dikir: «Ax! Xwedayê tarîtiyê, Gurê Manco tu li kû î! De were min merivê neçar, bi tenê, bigire bibe... tenê tu dikanî di nav baskên xwe ên tarî de min nependî bikî... tenê tu dikanî min ji gelac, fitne û çavsoran veşerî!» digot.

Serê xwe dîsa danî ser «balgihê» û xewê jî pêre mîna perdeyeke tenik xwe bi ser de girt. Hêj wusa deqeyek ne qediya bû; ji nişka ve rabû, rûnişt. Rahişt meterê xwe yê avê, devê wî vekir û jê av vexwar. Te digot qey bi vî babetî ê xewê ji ser çavên xwe birevîne. Lê xewê her zorî didayê; ew bû bû mîna dapîra wî ku di zarotiya wî de, di wan şevên dirêj ên zivistanan de dihat her şev li ber serê wî rûdinişt, jê re çîrok digotin ta ku di xew re diçû. Lê çîrokên ku nuha bi bîr dihanîn û di serê wî de vêdiketin, mîna yên dapîra wî bi xweşî û serfirazî ne diqediyan. Evana bîreweriyên jiyana wî ya dijwar bûn, çîrokên bextreşî û tenêtiya wî bûn, bîreweriyên xwîn û xwêdanê bûn!

Xwe ramidand ser tenişta xwe ya rastê, bi enîşka xwe pal-

da ser balgihê û destê xwe ji serê xwe re kire sitûn. Piştre çavên xwe li tarîtiya hundurê şikeftê gerand. Di niqteyeke tarî de awirên wî bê mane kom bûn û wusa ma. Hinekî şûnde jî êdî nema dizanî bû ku hişyar e, an di xew de ye.

Lê hişê wî bi bûyerên jiyana buhurî ve tijî bû. Dema ku hişiyar bû ev bûyer wekû bîreweriyên dijwar bi bîr dihanîn û dema ku radiket jî evana dibûn xewnên naxoş...

Merivê bi derd û tenê hergav bi xwe re di muhakemê de ye; ji ber ku ew piştî demekê fam dike ku nikane jiyana xwe ya buhurî bi tevayî ji bîr bike. Tenê tiştek di destê wî de dimîne ku car bi car li derbasiya xwe vegere û bi vî babetî qencî û gunehên xwe şirove bike. Ji ber vê jî dema ku bûyerên derbasbûyî bi bîr dihanîn, êdî zor li hişê xwe ne dikir ku wan ji bîr bike. Xwe bi herka bîreweriyan ve berdida û bi xeyaletên kesên wan re careke din mijûl dibû û ew bîrewerî ji nû ve dijiyan. Nuha jî hişê wî bi bûyereke wusa meşgûl bû:

Dawiya payizê bû, rojeke ewrîn bi ba û baran bû dema ku hevalek hati bû ew ji mal girti bû û biri bû edreseke nenas. Tenê jê re goti bû; «Hevalê berpirsiyar dixwaze te bibîne!» Wî gelekî nav û dengê «Hevalê berpirsiyar» bihîsti bû. Digel ku ew ne dîti bû jî, mîna ku ew nas dikir xeyaleta wî li ber çavên wî bû. Hevalê berpirsiyar wusa bê sedem bangî tu kesî ne dikir, bêguman eva karekî girîng e! Ji demeke dirêj ve jî ew li hêviya vatiniyeke girîng bû. Viya ê him qîmet û rûmeta wî di nav hevalan de bilind bikira û him jî mecalên kar û xebata ji bo dozê zêde bikira. Ji ber ku wî gelekî baweriya xwe bi vê dozê anî bû û bi her babetî dixwest ku ev doz bi pêşkeve.

Li kolanek ku ji deng û gumeguma bajêr hinekî dûr bû, di

deriyekî re ketin hundurê hewşeke fereh. Di hewşê re derbasî hundurê salonekê bûn, ji wir jî jinikek kin û bi cilên navmalî bergirtiya wan bû û deriyê odeyekê nîşanî wan da.

Ode bi şêweyekî basît û kurdî raxistî bû. Hevalê berpirsiyar li ser doşekek sînger, li quncikekî odê rûniştî û pala xwe dabû balgihekê û pirtûkek di dest de vekiri bû û dixwend. Dema ku derî vebû bi hêdîka serê xwe rakiri bû û bi beşişîn li wan nerî bû. Paşê jî pirtûk ji dest xwe danî bû û bi giramî ji cihê xwe rabû bû û xêrhatin li wan kiri bû. Ew li hêlekê û yê pêre jî li hêleke din ya hevalê berpirsiyar rûniştî bûn.

Hevalê berpirsiyar pêşiyê li halê wan pirsî bû û paşê jî bi şêweyekî kurt agahdarî di derheqê dozê de dabû wan, goti bû ku: «Doza me ya pîrozwer her roj geş dibe û gihiştiye xwegihîneke nû. Dijminê me yê xedar ji bo ku vê dozê bifetisîne bi her babetî êrîşan tîne ser me û em jî divê ji bo vê yekê amade bin. Bivê nevê, divê em şerê xwe bi şêweyekî çekdarî jî bidomînin. Beriya hertiştî jî divê em caş û xayînên nav xwe ceza bikin!»

Wî û yê din bi her babetî rastiya li paş gotinên hevalê berpirsiyar dişikirandin. Paşê jî li ser pirsa hevalê berpirsiyar wî di derbarê navçe de hin agahdarî da.

Piştî vê agahdariyê hersê bêhnikekê bêdeng ma bûn. Paşê hevalê berpirsiyar berê xwe dabû wî û bi beşişîn jê re; «Dozê biryar girtiye ku tu ê li vî navçeyî bibî berpirsiyar û koordînatorê me!» goti bû. Hevalê berpirsiyar di çend saniyan de ev gotin goti bûn, lê ji bo wî çend deqe girti bûn ta ku fam bike. Xwest ku bersivekê bide lê nizanî bû ê çi bibêje, tenê soromoro bû û di cihê xwe de xwe livand. Lewra qîmet û rûmeta

ku dozê didayê, piştî vê fam dikir û bi viya re gelekî kêfxweş û serfiraz bû. Lê dûre fam kir ku divê çend gotinan bibêje û; «Ku dozê ez laqî vê vatiniyê dîtime, tu gotineke min jê re tuneye. Eva ji bo min serfiraziyeke mezin e û heta ku ji min bê ez ê laqî vê vatiniyê bim.» got.

Di wê navbênê re jinika malê li derî xisti bû û bi tepsînek ku sê îstikên çayê li ser, keti bû hundurê odê. Wexta ku dest bi vexwarina çaya xwe kiri bûn, hevalê berpirsiyar nameyek derxisti bû û hêdî hêdî çavê xwe lê digerand, paşê berê xwe dabû wî û; «Eva jî biryareke din ya dozê ye û divê di hundurê mehekê de bê halkirin û dozê xwestiye ku tu bi xwe viya organîze bikî» got. Bi dû de jî name dirêjî wî kir ku lê binêre. Wî name girt û çavê xwe lê gerand, dema ku çend rêzên pêşin xwendin heyecanekê bi laşê wî girt lê hewl da ku vê heyecana xwe veşêre û her ku rêzek dixwend serê xwe mîna erê dilivand. Li dawiya namê jî îmzeyên hevalên ku hebûn zêde bala wî kişand:

«Li ser navê dozê;

Heval !!

Heval ??

Heval **»

Paşê dîsa name şûnde da hevalê berpirsiyar û wî jî li ser tepsîna çayê agir berda namê. Piştî ku name şewutî û bû arî, hevalê berpirsiyar dest bi axaftinê kir û; «Hûn vî caşî nas dikin û ji xwe rûniştevanê bajarê we ye, êdî tu wekû berpirsiyarê navçe hevalekî maqûl peyda dikî û vê vatiniyê didiyê» got. Bi dû gotina xwe de jî destê xwe kire bin doşeka sînger, ji bo vê vatiniya pîrozwer, demançeyek derxist û da wî. Wî rahişt

demançê û di destê xwe de qulupande vî alî û wî alî; malê belçîkî bû û lûleyeke wê î dirêj hebû.

Hevalê berpirsiyar êdî karê xwe qedandi bû, berî ku wî bi rê bike; «Ez îro ji vir diçim cihekî din; dibe ku heta demekê ez neyêm vir lê ev hevala ê li gel te di têkiliyê de be. Bi riya wî tu dikanî bi me re têkiliyê deynî.» got û xatir ji hevdu xwestin û ew bi rê bû çû.

Di riya malê de hişê wî her bi vî «Hevalê maqûl!» ve meşgûl bû. Di hişê xwe de lîsteyeke heval û dostên dozê ên navçe çêkir û xwest ku vî «Hevalê maqûl» hilbijêre û biçe vê demançeyê bidiyê û jê re bibê; «Aha, keko! Rahije vê demançê û ji kerema xwe re biçe vî merivê xayîn bikuje!» Lê, fam kir ku wusa ji nav meselê dernakeve û dev ji lîsteyê berda; lê biryar girt ku hemû hevalan sibehê li cihekî bicivîne.

Rojtira din, ber bi êvarê her serê çend deqeyan deriyê mala wî lê diket û hevalek an du heval derbasî hundurê odê dibûn. Hevalê dawîn li dor saet heftan keti bû hundur û civînê dest pê kiri bû.

Ji xwe hemû hevalên dozê ew berê jî wekû berpirsiyarê navçe dizanîn û bi wî çavî lê dinêrîn. Di vir de guhertina ku bû bû, ev bû ku ev vatiniya wî êdî fermî bû bû.

Wî civîn vekir û di derheqê dozê de agahdariyek kurt da hevalan, paşê jî; «Doz bi pêş ketiye:» got. «Ev yeka ji hemû hevalan fedekariyên nû dixwaze. Divê heval ji vatiniyên nû re jî amade bin!» Lê ev gotinên dawîn helbet bi qesteke din ve goti bûn, lewra dema fam kir ku bi vî babetî ew ê nikani be vê vatiniya nû bi hevalan bide fam kirin, axaftina xwe birî. Çû pirtûkek ji dolaba xwe derxist û da hevalekî ku bixwîne û yên

din jî lê guhdarî bikin. Eva ne cara yekem bû ku wusa dikirin; her serê çend rojan ê li malekê biciviyana û bi hev re pirtûkên li ser ilmê Marksîzmê bixwendana. Ev pirtûka jî yek wusa bû; ya diroka partîya Bolşewîk bû. Ji ber hevalên berpirsiyar herdem digotin ku; «Ji bo em bikari bin şoreşekê li welatê xwe darxîn pêşiyê divê em di derbarê şoreşên welatên din de agahdar bin.»

Ew li quncikekî odê rûniştî bû û mîna hemû hevalan li diroka partiya Bolşewîk guhdarî dikir. Lê di heqîqetê de helbet ne wusa bû, serê wî bi tiştekî din ve mijûl bû û yek bi yek hevalên li odê rûniştî di ber çavan re derbas dikir.

Xwe bi xwe: «Misto, Reşo û Nûro ji xwe zarok in û ji vatiniyeke wusan re nabin. Silo, Miheme û Şikrî jî nû têkilî danîne ew jî nabin. Şêrgo ê jî berê biçe ji diya xwe bipirse û Heznî jî zêde mirovperwer e evan jî nabin!» Fam kir ku tu kes ji van hevalan ji bo vê vatiniya pîrozwer ne amade ye. Çend dostên ku li derveyî vê civatê bûn jî ji binî de ji bo karekî wusa ne maqûl bûn. Viya hinekî dilê wî şikenand û fikrên naxoş kirin serê wî. Lê heta ku civat rûniştî bû tiştek li xwe dernexist û dilşikestiya xwe bi hevalan neda xuyakirin.

Dema ku civat belav bû xwe gelekî bêhal û neçar hîs dikir; çû li ser nivînan xwe dirêj kir û xwest ku ji vê kabûsa ha hişiyar bibe. Lê eva ne tu xewn û kabûs bû, lewra rastiyek bû û wî bi kar, tewr û baweriyê xwe gihandi bû vê rastiyê. Ji dîroka xwe ne bêxeber bû, dizanî bû ku di riya dozê de mirov ê werine kuştin. Helbet fikra ku ew ê rojekê bi xwe jî raserî tiştekî wusa bibe ne kiri bû. Lê çi dibû, di vê riyê de meriv guh li daxwazên şexsî ne dikir. Menfaetên raya giştî, ên xelk û welêt

di ser hertiştî re bûn û wî bi xwe jî digot; «Eva divê wusa be». Dizanî bû ku wekû ferdekî bi tenê xwe nikanî bû di ser dozê re bigirta, doz ji her kesî û hertiştî mezintir bû. Xwe bi xwe; «Piştî ku wusa ye, meriv ji bo dozê dikane bibe hemû tişt, ku pêwist be heta qatil jî!» digot. Bi dû ku raman û argumentên wusa hinekî xwe bi xwe minaqeşe kirin, dijitiyên di serê wî de kêm bû bûn û di xew re çû bû.

Sibehê dema ku ji xewê rabû bû, zû taştiya xwe kiri bû, xwe girêdabû û derketi bû der; ji xelkê dost û nas bi babetekî ku têdernexin, agahdarî di derheqê vî merivê xayîn de sitandi bû. Piştî heftiyekê jî êdî dizanî bû li kû rûdine -ji xwe kar nedikir-, diçe kîjan qehweyan, li kû digere û danûsitandinên wî bi kê re hene, hemû tiştên di derheqê wî de ku jê re pêwist bûn hîn bû bû. Bi dû vê de jî, heroj demançeya wî di berde, li kolanên bajêr, li dû vî merivê xayîn digeriya ku li xewleciyekî keysê lê bîne û wî binerd bike, bikuje.

Lê mîna ku pêşiyên me gotine, «Gotin û kirin nabe yek» û viya di vir de rastiya xwe bi hemû babetî beyan dikir. Lewra her ku fersend dikete destê wî nêzîkayî lê dikir ku dawiya vê vatiniya pîrozwer bîne, ew têdigihişt ku kuştina miroveki çendî zehmet e. Ew mirov çi dibe bila bibe, ger xayîn be û kuştin jî heq kiri be dîsa ji bo wî ewçend ne hêsan bû ku nikilê demançê bikişîne û li hemberî xwe vî mirovî di nava xwînê de bibîne. Ji bo vê hin tiştên zêdetir jê re diva bû û eva li ba xwe wekû kêmasî didîtin. Ji ber ku wî baweriya xwe bi vê dozê anî bû û ev doz bêyî kuştin ne dibû, ev jî dizanî bû; lê ev şik û dudiliya ku li ba wî çêdibû gelo ji bo çi bû, aqil ne didayê!

Rojekê, dîsa bêyî ku tiştek kiri be vegeriya bû malê, li paş

derî kaxizek dîti bû, li ser kaxizê; «Were wê edresa ku me cara dawîn hevdu dîti bû. Heval M!...» nivisî bû. Eva ji sîxurê dozê pêve ne tu kesekî din bû. Bêyî ku derbasî hundur bibe dîsa derî li dû xwe girti bû û rast riya wê edresê girti bû.

Dîsa li wê odeya kevn yê sîxur bi serê xwe rûniştî dîti bû, xêrhatin li hev kirin û paşê li tenişta wî rûnişt. Heval M. dest bi axaftinê kiri bû; «Gelek silavên hevalên dozê li we hene, ez doh ji ba wan hatim. Hevalê berpirsiyar bi karên din ve meşgûl bû an ne ew jî dihat» got. Paşê jî pirsî; «Ka, ew kara tu deng jê derneket, heval meraq dikin. Ger pêwîstiya we bi alîkariyekê hebe heval amade ne. Heta xwestin ku hevalê vî karî bike jî ew bişînin!» got. Lê wî; «Na!» got. «Pêwîstiya me bi tu tiştî nîne, ev kara di wexteke nêzîk de ê bibe, tenê silav û giramiyên me pêşkêşî hevalan bike!» Lê hinekî şûnde mane neda van gotinên xwe yên dawîn. Cara din jî dema ku ev vatinî qebûl kiri bû dîsa wusa kiri bû û paşê fikirî bû ku ji bo çi ev kara girti bû ser milê xwe. Xwe bi xwe; «Ev cara pêşin e ku doz karekî wusa dide ber min, ku ez ji viya re jî bibêm na, wê gavê karê min li cem wan çi dimîne?...» got. Lewra wî baweriya xwe bi dozê dihanî û di viya de tu şik jê re çênedibû, xwediyê vê biryarê jî doz bû, wî ê tenê nikilê demançeyê bikişanda û ji viya re jî tu hunereke zêde ne diva.

Wexta ku ji heval M. xatir xwesti bû û derketi bû der dunya tarî bû bû, ji dêlva riya malê, riyeke din girt û hêdî hêdî meşiya. Hinekî şûnde gihişti bû kolaneke dirêj, bêdeng û nîvtarî. Çend roj û şevên berê di vê kolanê re gelekî çû bû û hati bû û vir ji bo karekî wusa cihekî bêhempa didît. Ji ber ku goriyê wî jî hercar di vê kolanê re derbas dibû, diçû mal. Hêj

wusa dimeşiya û ji nişka ve dengina li paş xwe bihîstin. Wî, çi dibe û çi nabe digot û bi şevê dema ku li vê kolanê digeriya, ne dixwest ku kesek wî bibîne û nas bike; ji ber vê jî hinekî lezand, li quncikê dîwarekî bilind, li ber konteynekê xwe veşart.

Du zilam bi hev re dipeyivîn û hêdî hêdî ber bi wî dihatin. Qederê bîst metreyan jê dûr dîrekekî ceryanê hebû, yek ji wan çend lambeyên ku li kolanê vêdiketin jî bi vî dîrekî ve bû. Dema ku herdu zilam gihiştin ber şewqa lembê, wî li wan temaşe kir û xwest wan li ber şewqê bitefsilîne. Ji nişka ve mîna ku yek sîtilek ava sar bi ser de bike ji cihê xwe çemd bû. Ji ber ku yek ji zilaman, bi qama xwe ya kin, serê xwe yê girover, enîya vekirî, porê paşde şehkirî û bi berçavk ji goriyê wî pêve ne tu kesekî din bû. Çendî ku nêzîk jî dibûn, dengê wî jî nas dikir; mîna yê serxweşan qalind bû. «Na lo! ho ho ho... te çawa ew... ho ho..» digot. Xwe bi xwe; «Nuha û ne careke din!... ji vî cî û vê wextê baştir fersendeke din nakeve destê min!» got û destê xwe avêt qebza demança siwarkirî û li hêviya wan ma.

Herdu zilam bêyî ku hayê wan ji bayê felekê hebe axaftina xwe didomandin û rast ber bi wî dihatin, ji xwe riyeke din ku tê re biçin jî tune bû, ew ê her di teniştê re derbas bibûna.

Wusa di wê rewşê de fikirî ku ew ê çend derba berdiyê û li kîjan alîyê laşê wî... «Ji bo serê wî derbek bes e! Lê tarî ye, dibe ku ez derba pêşin birevînim. Lê ku ya dudiyan jî min revand... na, ez ê berdim sînga wî... dudiyan, na sisiyan... deng... yê pê re... nuha û ne careke din!»

Herdu zilam bêyî ku hayê wan ji bayê felekê hebe, sohbeta

xwe didomandin û hêdî hêdî di kolana nîvtarî de ji ber çavên wî bi dûr ketin, wunda bûn. Ew di cihê xwe de matmayî rawesti bû û destê wî yê rastê hêj li ser demançê bû. Ji ber xwe demançe ne kişandi bû û nikanî bû bikişanda; ji ber ku demança nîvkîlo mîna pêncsed kîloyan giran bû bû û mîna ku yekî ji paş wî ve ew hişk bi herdu destan girti bû, ji cihê xwe nikanî bû bilivîya û digel ku ew dûr keti bûn jî hêj kabokên wî diricifîn.

Hineki şûnde riya malê girti bû û dimeşiya, lê li ber xwe keti bû, hêrs bû bû û ji xwe şerm dikir. Xwe bi xwe; «Heyvanê cegerê bi min re tuneye, ez merivekî bizdonek im!» digot. Di rê de difikirî ku sibê biçe ba hevalên dozê, demançê bide wan û bibê; «Ez merivekî bizdo me, bi kêrî tiştekî nayêm û ne layîqî we me!» û bi vî babetî destê xwe ji hemû karê dozê bikişîne.

Dema ku gihişti bû malê ev fikra li cem xurtir bû bû û biryar da ku sibê bi rastî jî biçe wusa bike. Piştî vê biryarê mîna ku barekî giran ji ser milê wî rabû be xwe rehet hîs dikir. Wexta ku xwe li ser nivînan dirêj kir ku rakeve jî tu fikrên naxoş û kabûsan ew nerehet ne dikir. Pêre pêre mîna zarokekî zû di xew re çû bû.

Sibehê dereng ji xewê rabû bû, taştiya xwe kiri bû û ber bi nîvro ve rahişti bû demançê, kiri bû ber xwe û ji mal derketi bû ku biçe biryara xwe ya şeva din bi cî bîne. Tu şik û dudiliya ku biryara xwe bi paş de bigire, li ba wî çênebû bû.

Ji dêlva ku kolan û kolan mîna hercar biçe wê edresê, vê carê riya sûkê girt û çû. Li nava sûkê, li xaçerêyekê dema xwest ku derbasî aliyê din bibe mirovekî ku xwe li qapûtê xwe

pêçaye û dixwaze xwe ji barana ku nû dest pê kiriye biparêze bala wî kişand, dema ku pêrgî wî bû, dît ku goriyê wî yê şeva din e. Xwe bi xwe, bi beşişîn; «Dua bike, şensê te heye ku tu şeva din ji nav lepê min xelas bûy!» got. Bi dû de jî di ser milê xwe re hinekî lê nerî. Yê din li kêleka xaçerêyê derbasî hundurê dikanekê bû bû.

Wî xaçerê derbas kiri bû û çend gavan şûnde diket kolanekê, lê derbasî kolanê ne bû û paşde vegeriya. Xaçerê paşde derbas kir û ew jî derbasî hundurê wê dikanê bû. Dikan ne fereh lê dirêj bû, ji bilî goriyê wî yê şeva din du mişteriyên din li dikanê bûn. Jinek û mêrek li ber kîsekî fasûliyan rawesti bûn û jinikê destê xwe xisti bû nav kîs û mîna ku dixwest bala mêrê xwe bikişîne û bibê; «Ev ne baş in!» Lê bala mêrik li jor li ser refikê, li tiştekî din bû. Goriyê wî jî rahişti bû çaydanekî û bi xwediyê dikanê re bazar dikir; «Na lo... bi Xwedê eva li ba hecî Umer erzantir e!» digot. Lê wî bi dû ku hinekî çavên xwe li tiştên hundurê dikanê gerand û di bin çavan re hinekî jî li goriyê xwe yê şeva din meyizand, xwest ku derkeve. Hêj ne gihişti bû ber derî, yê dikandar li dû qêrîya; «Pismam, ma tiştek ji were pêwist bû?...» got. Ew li dû xwe vegeriya û; «Na, sipas!» got. Lê di wê gavê de awirên wî û yê goriyê wî bû bûn yek. Û ji nişka ve destê wî çû bû ser demançê, ji ber xwe derxisti bû berê wê dabû wî, gaveke din jî ber bi wî avêt û sê derb li pey hev di singa wî de berdan. Tu deng ji goriyê wî derneketi bû, çaydan ji dest keti bû û çend saniye şûnde jî bêruh li erdê, li ber lingên wî dirêj bû bû. Tenê yê dikandar behîtmayî; «Na...na!» diqêrîya.

Ji cihê xwe çemd bû, mîna ku li derveyî şikeftê dengina di-

bihîst. Di viya de jî ne şaş bû, yekî; «Na, na... were vira ew kete hundurê vê kuna ha!» digot. Paşê jî çend dengên din lê zêde dibûn û nêzîk dibûn. Xwe bi xwe; «Çi kete hundurê vê kuna ha! Li vê derê ji şikefta min pêve tu kun tunene» got û paşê jî çavên xwe li tarîtiya hundur gerand. Li quncikekî dema du çavên beloq ku dibiriqîn dît, wê gavê rahişt çeka xwe û berê wê da wî alî. Lê dûre fam kir ku nikane di hundur de wê biteqîne, dengê ku jê derketa ê guhên wî ker bikira. Wusa çek di dest de xwe nêzîkî mehlûqat kir ku fam bike bê çi teba ye. Ji lebt û dengê wî têderxist ku roviyek e. Rovî xwe di quncik de asê kiri bû û rabû bû ser herdu lingên dawîn û bi lepên pêşin jî xwe diparast. Her ku wî nêzîkayî lê dikir irîniya rovî zêde dibû û ji êrîşê re xwe amade dikir.

Dengên li derveyî şikeftê fesaltir dibûn wusa xuya dikir ku sê nêçîrvan bûn û tajiyekî wan jî hebû, ji ber di nav dengên mirovan re kazekazek jî dihat. Hinekî şûnde yekî ji wan; «Em tajî berdin...» got. Lê yekî din; «Na, wê rovî tajî birîndar bike!» got. Yê sêyemîn; «Em agirekî di kunê de bikin, wê gavê rovî ê derkeve!» got. Dema ku ev gotin bihîstin xwe nêzîkî rovî kir û; «Aha, eva xirab e birakê rovî. Divê yek ji me derkeve der an ne em ê herdu jî ji dûyê di vir de bifetisin!» got. Paşê jî bi lûla tivinga xwe xwest rovî daf bide. Lê rovî mîna ku dixwest bibê; «Vira ne cihê şer e!» irîniyek ji xwe anî û bi lez çû aliyê din î şikeftê, lê heta ku jê hati bû xwe dûrî qula ku derdiket der digirt; ew alî fereh dihişt mîna ku jê re bibê; «Kerem bike! Çima ne tu?»

Çend caran wusa wî û rovî di hundurê şikeftê de hevdu birin û anîn lê yekî zora yê din ne bir! Çi rovî bû, bi hemû tew-

rên xwe dida famkirin ku qet dilê wî û derketina der tuneye! Dema ku wî dengê şikandina daran bihîst fam kir ku wexta wî hindik maye. Dev ji rovî berda tiştên xwe berhev kirin, ber bi cihê derketinê çû û di qulê re bi zikişkê derket der.

Tajî û nêçîrvanên ku li hêviya rovî bûn, dema dîtin ku ji dêlva rovî ve zilamek bi rext û tivingê pêçayî ji kunê derket der, behetmayî man, qêrîn bi wan ket û ji wir reviyan.

Dunya esra dereng bû, germiya tîrêjên royê kêm bû bûn û ro li ber avaçûnê bû. Ji cihê ku hinekî kaş bû, xwe ber bi newalê ve berda, berê xwe da çiyayekî bi dar û devî, li aliyê din î newalê û lezand.

Dema ku gihişt binê newalê, dengek bihist. Yekî ji nêçîrvanan bi dengekî bilind ji hevalê xwe re digot; «Ew ne rovî bû, Mehkûm bû!...» Gotina Mehkûm li newalê olan dida, car bi car dibû: «Mehkûm, mehkûm» mîna ku ne dixwest vî dengî bibihîse herdu destên xwe danîn ser guhên xwe û di nav deviyan de ji ber çavan winda bû.

# EZ Û HEYKEL

Em li ber heykelekî civiya bûn. Heykel, li qiraxa golê, li ser erwazekî bû. Em deh kes bûn; pênc keç, ji bilî heykel em pênc kes jî mêr bûn. Wusa dixuya ku heyîna heykel, ji min pêva bala kesekî din ne kişandi bû. Belkî jî ji ber ku ez bi tenê biyaniyê wê derê bûm loma...

Ne dihate famkirin bê heykel temsîliya çi dikir. Tu nivîs li ser hîmê wî ne dixuya. Dibû ku heykelê qehremanekî bû... Lê tu diruvê qehremaniyê jî pê ne diket! Şipya bû, lingên wî yên ji hev ji bo gavavêtinê amade bûn. Gopalê di dest de ku bilind kiri bû, ji daristana hemberî me pêve tu dever nîşan ne dida. Birhên wî mîna hejikên ser sêncan bel bûn. Bêvila wî ya mezin dîmena dev û ruwê wî yê nelihev bêtir xera dikir. Qa-

ma wî ne kin û ne jî direj bû. Lê dîsa jî hîmê wî yê ji mermer dida xuyakirin ku di wexta xwe de bi qedir û qîmet bûye.

Me sifra xwe li tenişta heykel danî bû. Lewra ji wê derê, me bi hêsanî dikanî bû li golê û şînahiya daristanê temaşe bikira. Bi rastî cihekî ewqas xweş bû ku meriv dikanî bû li wir rûnişta û di rojekê de çend şiir jî binivisiya.

Min pişta xwe dabû hîmê heykel. Pêşiyê min got qey bi gopalê di destê xwe de gefta li min dike, ez jê tirsiya bûm. Lê dûre min xwe bi xwe; «Ma meriv qet ji heykelekî jî ditirse!» got û pala xwe da hîmê wî.

Ro di aso de hêdî hêdî diçû ava, şûna xwe bêdil ji tava hîvê re dihişt. Li jor ezmanekî bêewr, ji stêrkan xemilî û li xwarê jî xweşikbûna xwezayek ku bi bêjeyan ne dihat teswîrkirin...

Me him ji fêkiyê ser sifrê ditamand û him jî şeraba xwe hêdî hêdî vedixwar. Gerçî nizanim çima, lê min hinekî bi pît vedixwar!

Dawiyê yekî ji me şekirek dişikand! Dest pê dikir ji mijarên romantîk dipeyivî. Behsa hewayê kir; di wê bêhnikê de te digot qey ji bo ku axaftina wî romantîktir bike, di ser me re pêlik bayê hênik derbas bû. Wî axaftina xwe berdewam dikir, bi rengekî gelekî xwezayî gotina xwe ji ser hewayê guherand ser cemedê. Lerzekê ji sermayê bi me teva digirt! Wî piyaloka xwe hildida, gulpek ji şeraba xwe vedixwar, me jî pê re... Wî axaftina xwe bi katkirina çîroka H.C.Andersen ya bi navê «Xatûna Cemedê» didomand. Digot ku; «Yê sêrdar neynikek efsûnî çêkiri bû. Yê ku di vê neynikê de li xwe dinerî... li dunyayê hertişt xerab didît. Dûre yê sêrdar xwest vê neynikê derxîne ezmên ku melek jî di wê de li xwe binêrin. Lê neynik

li ezmên hûr hûrî dibû û weke xweliyê dibariya xwarê. Ew kesên ku piçek ji xweliya vê neynikê keti bû çavên wan, dest pê dikirin hertişt çewt û xerab didîtin.»

Dûre jî got ku kêfa wî mêrî gelekî ji vê çîrokê re tê. Dema ku weha got, min gotina wî birî û digel ku qet pêwîst ne dikir, dîsa jî min got; «Kêfa min zêdetirîn ji çîroka Keçika Kibrîtfiroş re tê.» Lê pêre pêre jî ez bi gotina xwe poşman bûm.

Serî tev fitilîn ser min, çavan teva li min nerî, komek guh xwe miç kiri bûn û mîna ku bibên; «De bêje, vêca em li te guhdarî bikin!» Lê mixabin, tiştekî min î ku ez ji wan re bibêm tune bû. Ne zimanê min têrê dikir û ne jî dilê min qîm dikir. Min ji herkesî bêtir dixwest ku ez guhdarî bikim. Dema ku wan jî evaya fam kirin, dest pê kirin cot cot bi hev re axifîn. Yek bi yek ji hev re navên çîrokên ku jê hez dikirin gotin. Wusa peyv dirêj dibû, ji mijarekî derbasî ser yekî din dibûn.

Mîna heykel, heyîna min î li wir jî zêde ne di bala kesekî de bû. Pêşiyê li gor dilê min bû, kêfa min ji vê re dihat. Mîna nêrevanekî tenê bi çavên xwe min civat dadiwerivand û di serê xwe de analîza şexsiyetên wan dikir. Lê dûre ez ji vê vatiniyê aciz bûm û min xwest xwe bidim xuyakirin. Xwestinek ku bi hinekan re mijûl bibim li cem min çêbû ku êdî min nikanî bû rê li ber bigirta. Cara dawîn dema min bi awirên xwe civat dawerivand; li aliyê xwe yê çepê min keçek keşif kir. Du gavan dûrî min xwe serî xwe bû. Yên din tev bû bûn zo. Ango yek nêr û yek mê...

Li wê derê ez, keçik û heykel ma bûn. Li gor ku heykel bêgiyan, ji kevir bû; ez û keçikê pişka hev diketin. Gava ku ez wusa fikirîm, tu sedem ji bo ku neçim pê re nepeyivim min ne

dît. Ji xwe dema ku wê jî carekê duduyan di bin çavan re li min meyizand, êdî ji bo axaftinê ez amade bûm!

Bêyî ku bizani bim ez ê çi jê re bibêm min hilda xwe ku herim cem. Lê bi hildana min re, ji nişka va pîhnek wusa bi pît li pişta min ket... Dunya li dora min zîvirî, kabokên min zîz bûn, min nema ber xwe dît, di cihê xwe de ez kumişîm û bêhemdî xwe ez qêriyam!

Hemî fitilîn ser min û bi devekî gotin; «Çi bû?» Dema min serê xwe zîvirand, li paş xwe min ji heykel pêve tu kes ne dît; «Heykel pîhnek li min da!» min got. Hemî bi min keniyan, teva; «Henekên te çiqas xweşin, lo!» gotin.

Bi rastî li paş min ji heykel pêve tu kes tune bû. Dema min lê nerî bû ez têgihişti bûm ku lingên wî jî ne li cihê berê bûn. Gopalê ku di dest de jî bilindtir bû bû. Çavên wî yên kevirîn bi awirên dijwar li min dinerîn. Weke ku bibê; «Eger tu xwe hinekî din nêzîkî wê bikî, ez ê vî gopalî li serê te bidim!»

Yên din zo zo rabûn li nava daristanê belav bûn. Li wê derê keçik, ez û li paş min jî heykel ma bû. Ji tirsa heykel bêyî ku ji cihê xwe bilivim ez rûnişti bûm û difikirîm bê ez ê xwe çawa ji nav lepê vî heykelê çavnebar xelas bikim! Keçik jî li cihê xwe rûniştî, goşîk tirî di dest de, jê dixwar; serê gavê jî li min dinerî û dibişirî.

Teqnekî weha me li hev meyizand, dûre min biryar da ku rabim biçim balê. Min piyaloka şerabê ya dawîn bi ser xwe de kir, hemû hêza xwe civand û hinekî bi hêrs ez rabûm ser xwe. Lê bi rabûna min re pîhnek ji ya berê bi deh caran hêztir li pişta min ket. Ez bi deverû ketim, li erdê dirêj bûm. Hişê min ne çû bû, lê janekê wusa dijwar bi canê min tevî girti bû ku

êdî min nikanî bû xwe bilivanda. Te digot qey qorika min bi derbekê re felişî bû. Weke ku bîhna min bi carekê çikiya be, deng û his ji min dernediket.

Wusa dixuya ku keçikê tiştek fam ne kiri bû. Ji dêlva ku were alîkariya min bike, tiqetiqa wê bû bi halê min dikeniya. Evaya jî ji derba heykel bêtir bi min zor dihat.

Nizanim bê li erdê ez çiqasî dirêjkirî ma bûm. Dema ku ez bi ser xwe ve hatim, yên din ji nava daristanê vedigeriyan. Tiştê ku bi serê min de hati bû min ji wan re kat ne kir, ji xwe ew ê kesekî ji min bawer nekira. Herwcha keçikê jî behsa tiştekî ne kir. Lê gava ku çavên wê bi min diket ew her dibişirî.

Şev dereng keti bû, êdî wexta çûyîna malê bû. Me firaxên xwe berhev kirin û em bi rê ketin. Dema em gihiştin bajêr, me ji hevdu xatir xwest û em belav bûn. Herkesî riya mala xwe girt, lê ez bi şûnde vegeriyam cem heykel.

Min çend fitil li dorê avêtin û min hezar çêr jê re kirin. Wî qet di xwe dernedixist, mîna hemû heykelan ji cihê xwe ne diliviya, bêdeng û bêhîs bû. Di dilê xwe de min got; «Keçik ne li vir e, loma!» Lê min dev jê berneda; ez çûm ser hîmê wî, min xwe dayê da wî bixim erdê. Qeweta min têrê ne kir, min bi herdu destan bi gopalê wî ve xwe daliqand ku bişikênim lê ew jî ne şikest. Dûre min dît ku bi vî babetî ez ê nikani bim xisarekê bidimê, ez daketim, çûm ji perava golê min ber sînga xwe tijî kevir kir û hatim li ber veketim. Lê wê jî xêr ne kir! Kevirên ku min davêtinê dîsa jê dipengizîn, dihatin li binguhê min diketin. Min fam kir ku ji wî zêdetir ez ê xwe birîndar bikim. Şev jî dereng bû bû êdî. Ji neçarî min kevir avêtin erdê û pîs pîs reya malê girt...

Berî ku ez ji cem bi dûr kevim min jê re; «Tu qet nefikire ku ez ê wusa dev ji te berdim! Ez nuha diçim lê bizani be ku ez ê sibê dîsa vegerim. Ez dev ji te bernadim ta ku te ji ser hîmê te bigindirînim...» got.

# KEÇIKA PIÇÛK

Wê sibê ew zû ji xewê rabû bû; dizanî bû ku diya wê nexweş e û ji nav nivînan nikane derkeve. Ev serê çend rojan bû ku nexweş bû, şevtira din jî nexweşiyê lê kêr kiri bû, ev jî ji dengê nalînên wê fam kiri bû.

Sibehî, wexta keçika piçûk ji xewê rabû bû xwe ji bo hemû karên malê amade didît. Û bi rastî jî wisa bû. Ew gelek caran li gel diya xwe û pîrekên din bû dema ku wan kar dikirin. Wêya him alîkariya wan dikir û him jî li wan dinihêrî bê çawan kar dikirin. Ji ber vê jî gelek ji van karan ji nuha de ji ber kiri bûn; wek êmkirina heywanan, malajtina hundurê malê, pêxistina sobê û çêkirina şorba nîskan jî yek ji wan karan bû ku ev çend car bû xwe lê ceribandi bû û hema hema ew jî êdî

bêqusûr dikir.

Hersê karên pêşîn digel ku ji bo keçikek heştsalî ewçend ne hêsan bûn jî dîsa bêqisûr û di wexta xwe de kiri bû.

Di vê navbênê de diya wê, mîna ku ne dixwest keçika wê ya piçûk zêde xwe biwestîne, xwesti bû ji nav nivînan derkeve. Lê ew hêj di nav nivînan de rûnişti bû û pêre pêre, ber çavên wê tarî bû bû, serê wê gêj bû bû û dîsa bi paş de keti bû.

Keçika piçûk xwe zû bi diya xwe ve gihandi bû; «Dayê! Ranebe ser xwe, tu nexweş î. Ji xwe karekî ez zêde bikim ne maye. Tenê ez ê biçim ser kaniyê avinê bînim û şorbeyekê çêkim.» goti bû. Diya wê bi destê keçika xwe ya piçûk girti bû, bi heyranî û evînî lê nerî bû; «Delala min!... ku ne ji te ba halê min ê çi ba?» goti bû. Paşê jî destê xwe di ser porê wê yê ku hinekî bû bû gijik re biri bû û; «Eva sê roj in ku min porê te şeh ne kirîye!» goti bû. Lê keçika piçûk mîna ku bibê; «Xem nake!» bi diya xwe re bişirî bû, paşê jî şerbikê xwe li ser milê xwe kiri bû û rast riya kaniyê girti bû.

Destpêka sibatê bû, lê dunya hêj sar bû; ewrekî tarî, ripûreş xwe bi ser gund de girti bû. Ji hewşan marcamra kahr û berxan dihat; li hewşekê ku berxek an jî kahrek bimariya, kahr û berxên li hewşên din jî dest pê dikirin dimariyan. Te digot qey bi vî babetî bersiva hevdu didan, li hevdu dipirsin. Carina borîniya mangan û dewarên din jî tevî vî dengî dibû. Dengê hemûyan pevre bi meriv orkestreyek ku awazên cuda cuda jê dertên bi bîr dihanî.

Mala wan li çepê gund, li cihekî kêmxanî bû; ji ber vê jî keçika piçûk bi riya kaniyê de pêrgî kesekî ne bû. Tenê qijalekê ku xwe li ser sênceckê danî bû; «Qij, qij!» qêriya û hat xwe li

ser rê, li pêşiya wê danî. Keçika piçûk rahişt sixurekî û avêtê; «Bifire! Here bi riya xwe de, qijaleka pîs!... tu çi dixwazî!» got. Lê qijalek firiya û çû çend gavan jê wir de xwe danî. Wê dîsa rahişt sixurekî, avêtê, lê dema dît ku fêde nake, êdî hew guh da qijalekê.

Dema keçika piçûk gihişte ser kaniyê, dît ku kanî zuwa ye, tu av ji lûla kaniyê ne diherikî. Kêlîkekê wisa mîna ku nizani be çi bike, şerbikê wê li ser milê wê bû û li hawirdora xwe nerî. Di wê navbênê de qijalek hati bû xwe li ser koşeyeke dîwarê kaniyê danî bû û dîsa dikire qijeqij. Dema awirên keçika piçûk bi qijalekê ket, di serê wê de fikrek pêket.

Keçika piçûk ji ba kaniyê bi dûr ket, lê ne riya malê, riyeke din girt. Wê biryar dabû ku ew ê bi şerbikê zuwa venegeriya malê. Wê dil hebû ku serê vê sibê ji diya xwe ya şêrîn re şorbeyekê çêbike, diya wê ya ku nexweş keti bû û nikanî bû rabe ser xwe.

Carina ku bi diya xwe re dihate ser kaniyê û dema ku didîtin kanî zuwa ye, wê gavê ev rê digirtin. Ji ber ku ev riya diçû ser sarincekê li aliyê din yê gund. Li wê sarincê ava baranê kom dibû û dema ku kanî ne diherikî, gundiyan ji vê sarincê av dihanîn. Nuha keçika piçûk jî riya vê sarincê girti bû.

Bi vê riyê de jî pêrgî kesekî ne bû, bi tenê ew û qijalek bûn, ji ber ku qijalekê hêj bela xwe jê venekiri bû. Her serî gavê dihat xwe li ser rê li pêşiya wê datanî. Carekê keçika piçûk ewqasî nêzîkî qijalekê bû ku xwest pîhnekê lê xe, lê qijalek firiya bû.

Sarinc ji ava baranê tijî bû bû; keçika piçûk dizanî bû ku gelekî kwîr e û viya hinekî xof xiste dilê wê. Lê wê dizanî bû

ew ê çawa bike; mîna diya xwe hêdî çû ser neqebê û paşê jî hêdî şerbikê xwe xist nav avê. Bayê di şerbik de bi buqebuq jê derdiket û şûna xwe ji avê re dihişt. Keçika piçûk bi destekî bi kevirê neqebê girti bû û bi destê din jî şerbikê xwe yê ku tijî av dibû. Hêj wisa di vê rewşê de bû û ji nişka ve awirên wê çûn ser tiştekî û viya bala wê kişand.

Li aliyê wê yê çepê çîçekeke hêşîn di ber kevirekî neqebê re serê xwe derxisti bû û mizgîniya biharê dida. Lê viya di serê keçika piçûk de bîreweriyek vêxisti bû.

Digel ku wê gavê hêj pênc salî bû jî ev bîrewerî weke îro bi bîr dihanî. Wê çaxê bavê wê hêj dijiya. Gerçî nuha bavê wê li ezmanan bû; pêşiyê ew li wir bû bû mêvanê kal û pîra wê û paşê jî ew ê xaniyek ji xwe re ava bikira û li hêviya diya wê bima. Dema wê pirsa bavê xwe dikir diya wê jê re wisa kat dikir. Lê di vî warî de pirsên wê gelek bûn û bi pirsên xwe serê diya xwe herdem gêj dikir. Diya wê gelek ji pirsên wê dibersivand, lê ji bo hinekan jî tiştek ne digot. Carekê jî dema ku pirsek kiri bû diya wê hêrs bû bû. Wê pirsî bû; «Çima bavo paşde venagere, ma qey ji me hez nake?» goti bû. Lê dûre diya wê jê re kat kiri bû; ku dema meriv çû ezmanan, ji wir êdî meriv nema dikane bi paş de vegere. Lê helbet wê ê jî rojekê bavo li ezmanan bidîta. Lê ne nuha ji bo wê gelek wext diva.

Keçika piçûk hêdî destê xwe yê çepê avêt çîçekê û ew ji ber kevir jêkir û paşê jî serê xwe bi jor de kir. Li wir, li ezmên, li cihê ku bavê wê xaniyek ava kiri bû û li hêviya diya wê dima; xeyaleta bavê wê li ber çavên wê vêket. Weke wê roja biharê, dema ku ji çolê vegeriya bû malê, baqek çîçekên

rengareng di dest de bûn û dibişirî. Wê gavê wê goti bû qey bavo ev çîçekana jê re anîne û gelekî kêfxweş bû bû. Lê bavo çîçek dirêjî diya wê kiri bûn; bi viya pir kêfa diya wê hati bû û bavê wê maç kiri bû. Lê ew hêrs bû bû û ta êvarî jî ji bavo xeyidî bû. Lê êvarî dema ku bavo jê re baqek çîçek anî bûn wê çaxê pêre li hev hati bû.

Lê nuha bavo li ezmanan bû û nikanî bû vegeriya. Lê îro li şûna bavo wê ê ev çîçeka bida diya xwe, da hinekî be jî wê kêfxweş bike û paşê jî vê bûyera ku nuha bi bîr dihanî jê re kat bike.

Di wê navbênê de jî şerbikê wê tijî av bû bû, buqebuq jê nema dihat û binav dibû. Keçika piçûk hewl da ku şerbikê xwe ji nava avê derxîne, lê ji ber ku destê xwe yê çepê ji neqebê berda bû, giraniya şerbikê tijî av, wezna wê xera kir û ew bi pêş de kişand nava avê...

Dunya sar bû, baraneke hûrik dest pê kiribû dibariya, ji nav gund maremara kahr û berxan dihat, ji bixêriyên xaniyan dixaneke hêşîn derdiket û ber bi jor, ber bi ezmên bilind dibû. Qijalekê xwe li ser kevirên sarincê danî bû û mîna ku li hinekan hewar bike bi qîjeqîj diqêriya; lê keçika piçûk ji mêj ve mêvana bavê xwe bû.

# KEN

Çûnûhatina bazara bajarê M.'ê pir zêde ye. Û herwcha barkêşanî jî... Ji berbanga sibê heta derengiya êvarê ji mirov û tirumpêlan rê-rêwanî di bazarê de tuneye. Çûyîna ji aliyekî bazarê, heta bi aliyekî din ji bo mirovekî ku ne fêrbûyê vê derê be gelekî zehmet e.

Ji ber ku bajar li ser çiyayekî hatiye avakirin, bazar û kolanên wê pir teng in. Ji bo ku meriv here ji dikanekê pakêtek cixare bikire, an biçe li aşxanakê xwarinê bixwe, an jî bixwaze biçe qehweyekê çayekê vexwe; divê mirov di derenceke bilind û dirêj re dakeve xwarê an jî bi jor de hilkişe.

Ev daketin û hilkişîna ji bo mirovekî destvala dîsa hêsan e. Lewra ji bo barkêşekî ku 150-200 kîlo giranî li ser piştê... bi

rastî jî gelekî zehmet e. Lê weke ku tê zanîn, zikê birçî li tu zehmetiyan meyze nake.

Digel ku her roj yek di van pêlikan re tevî barê xwe digindire tê xwarê, an di bin pêçkên kamyonekê de dimîne, can dide, dîsa jî mirovên ku barkêşiyê dikin roj bi roj zêdetir dibin û kêm nabin.

Wê rojê nizanim bi çi karî ez li bajêr bûm. Ji bo ku pakêtek cixare bistînim ji hotêla xwe derketim. Civatek mirovên ku li jêra derenceyeke kevirîn li ser rê kom bû bûn, bala min kişand û nêzîkî wan bûm. Tîtetîtê tirumpêlan bû, ji bo ku derbas bin rê dixwestin lê xelk bi tiştekî din ve meşgûl bûn û kesekî guh ne dida wan.

Dema ku gihiştim cem civatê, ez rastî dîmeneke dijwar û berbat hatim, ayy! ayyy! Ma meriv wisa li hevdu dike! Du barkêşan hevdu di xwînê de hişti bûn. Bi çenqelên ku pê barkêşiyê dikin mîna ku meriv ji xwe re erdekî bi gîsin cot bike, wisa xetxetî ruwên hevdu qelişandi bûn. Sê çar xwedî xêr keti bûn navbêna wan ew navcî kiri bûn. Di wê navbênê de polisek jî xuyanî bû.

Polîs pirsî:

- Çi ye? Çi bûye? Ji bo çi hûn şer dikin?...

Herdu barkêşan destmalên xwe ji bêrîkên xwe derxisti bûn, pê xwîna li ruwê xwe paqij dikirin. Ji herduyan yê ku hinekî bi emir û porşîn bû, dest bi axaftinê kir:

- Begê min, ezbenî!...

Kelogirî bû, weke mirovekî ku heqaret dîti be dipeyivî.

- Ez mirovekî feqîr, jar, xwedî şeref û namûs im! Ez destûrê nadime tu kesî ku henekê xwe bi min bike, bi min bikene...

Barekî 150 kîlo li nav milê min -bi destê xwe telîsekî mezin î tijî firax rê da- ez di vê derencê ve, bi jor de hildikişîyam...

Di vir de, dengê wî kêm bû, fena mirovekî ku şerm bike axaftina xwe domand.

- Ba ji ber min çû! got. Eva tiştekî gelekî xwezayî ye. Lê ev yê ha -barkêşê li hemberî xwe nîşan da- ji dêlva ku mîna mirovan bê bi min re alîkariyê bike, barê min hilde... Erê ji dêlva... li paş min rawestiye û tiqetiqê wî bi min dikene!... ku hûn bana we ê çi bikira?

Dema ku wisa got yê polîs sor bû û li dora xwe meyizand.

Barkêşê din bi hêrs:

- Ez ê bikenim, got. Çiyê kê ji kenê min heye; bayê ku ji ber te çû bû haya min jî qet jê tune bû. Kenê min hat, ez keniyam ewqas! Ma qey qedexeye ku meriv bikene, kî dikare qedexe bike!... Aha, ez ê dîsa bikenim!... got.

Paşê jî dest pê kir dengin ecêb ji qirika xwe derxistin. Lê ev ji ken zêdetir nalîna mirovekî birîndar dihanî bîra meriv: «Ho hoo, hee heee ih...» digot. Pirqînî bi civatê keti bû. Lê barkêşê porşîn ji viya aciz bû, berê xwe da yê polîs û bi dengekî jar:

- Hîna jî dikene!... got.

Yê polîs bi çeplên herduyan girt û got:

- Bimeşin! Li polîsgehê em ê vê doza we safî bikin...

# REŞBELEK

*5 Gulan 1986 / Mêrdîn*

Birayê ezîz ***!

Berî ku dest bi reşbeleka xwe bikim gelek silavên germ ji te re rêdikim, ji herdu çavên te ên reş radimîsim...

Lo birawo, ev bûn deh name ku min ji te re şandin, eva jî ya yanzda... Lê ji te, me hêj tu bersiv ne girt! Qe neba me bizaniya ku tu sax î, rehet î... Viya wê dilê me têxista cî, kêfa me bihaniya. Diya min bi girî herdu çavên xwe kor kirin! Her roj rûdine, saetekê digirî û dibê; «Saloxên ** min ji min re bînin!» Pitepita bavê min bi ser min de, dibê; «Tu ji qezda wilo

dikî! Tu naman jê re naşînî!» Ez fikirîm ku dibe te navnîşana xwe guherti be û ez çûm min navnîşanek hevalê te ji bavê wi tika kir. Li ser wê navnîşanê jî min çend name şandin. Lê dîsa jî, digel ku ev serê sê mehan e ku em bersivekê ji te dipên... bêfêde ye!

Birayê delal! Em bi hesreta nameyeke te ne. Ez ji te tika dikim... Tu ê nameyekê ji me re bişînî, vê hesreta me biborîne. Ma qey tu qet nafikirî ku birayê te, xwengên te, bavê te, diya te, em hemû li hêviya nameyeke te ne. Ma qey qet em li bîra te nayên!... Tu ê me bêderb bikujî lo! Tu berê ne wilo bûy; nizanim çi bi te hatiye.

Îro dîsa hingî bavê min kire pitepit, got; «Tu çima nama jê re naşînî» Ez rabûm min rast reya bajêr girt, çûm postexanê da ji te re telgirafekê rêbikim. Lê karmendekî nas li wir ez bi zor sekinandim û got; «Seyr e! Tu ê du rêzikan binivisînî û qiyametek pere bidî! Wisa meke, baştir e ku tu jê re nameyekê bişînî...» Ez vegeriyam, li qehwa Omeriya rûniştim û min dest bi nivisandina vê namê kir. Aha, li ser masa min du gundiyên me; Cindî û Hamîd jî rûniştine, bi qeremaçan dileyizin. Ew ji silavan li te dikin.

Wekî din ku tu li me bipirsî; em tev rehet in, selamet in. Em tenê xweşiya te dixwazin û bi hesret li hêviya reşbeleka te ne.

Bi silavên germîn...

Birayê te
Evdella

*25 Gulan 1986 / Stockholm*

Birayê xoşevîst Evdella!

Reşbeleka we ya bi tarîxa 5.5.1986 kete destê min. Ez pê gelekî kêfxweş bûm, sipas! Her weha namên berî vê jî ku we şandi bûn tev ji mêj ve ketine destê min. Lê mixabin ku ji ber hin sedeman min ne dixwest ji we re nama rêbikim. Ango bi şandina nameyeke xwe min ne dixwest we têxime talûkê! Bawer im hûn fam dikin bê ez dixwazim çi bibêm. Ku we ewçend israr nekira min ev name jî ji we re ne dişand.

Birayê hêja! Tu di nama xwe de dibê; «Ma qey em qet li bîra te nayên!...» Ma kengî hûn ji bîra min çûne?! Di xewnên min de, di xeyalên min de her hûn hene; ma li darê dunyayê qet tiştekî wisa dibe! Bi rastî jî bi van gotinên te ez gelekî êşiyam. Û ji îro pêve ez ê bersiva hemû nameyên ku ez ji we bigirim, bidim. Ma qey tu dibê ez naxwazim nameyan ji we re bişînim!...

Wekî din jî qet mereqa min nekin. Ez gelekî baş û rehet im. Ku derdekî min hebe ew jî xweşî û selametiya we ye. Ji dê û bavê min re gelek silavên min bibêje, ez destê herduwan radimîsim. Gelek silav û giramiyên min ji xweng û birayên min re pêşkêş bike. Bimînin di xweşiyê de.

Bi silavên biratî

Birayê te

* * *

*30 Tîrmeh 1986 / Izmîr*

Reşbeleka te tevî çend polîs û cendirman kete destê me!... Şensê min hebû ku ez wê rojê ne li mal bûm.

Ro li nîvro cemsak tijî polîs û cendirme, reşbeleka te di dest wan de, digirin ser mala me. Hundurê malê qul bi qul saxtî dikin, her weha axur jî... Helbet tiştekî bi dest naxin. Ji xwe ew çend pirtûkên ku te li malê hiştî bûn min ji mêj ve şewutandi bûn. Piştî ku malê saxtî dikin bavê min û herdu biran, Kezebo û Fexredîn davêjine cemsê û dibine tabûrê. Heftîkê ew di bin daran de nehawî kiri bûn. Ji wan re; «Çawa bi vî xayînê dewletê re têkiliya we hêj heye! Demek hûn jî xayîn in!» dibên û wana didine ber daran.

Ji xwe eynî rojê (bi karekî ez çûbûme gundekî din) gava ku min evaya bihîst, min go lingo bi qurbano û ez reviyam hatim Izmîrê. Ev serê du mehan e ku ez li vê derê xwînî me. Li gor saloxên ku min ji mal hilanîne: Bi dû ku ew berdane, bavê min û herdu bira, heftîkê di nav nivînan de bêhal raketine. Piştî heftîkê, Kezebo û Fexredîn baş bûne... Lê li gor dibêjin, bavê min hêj di nav nivînan de ye û xwîn vedirişe. Gelek dibên ew ê êdî ji nav nivînan dernekeve.

Bi kurtî tiştê te û reşbeleka te bi serê me kir, dijmin bi serê dijmin nake! Ma qey te nizanî bû ku li vir li te digerin! Ma qey te nizanî bû ku tu xwîniyê dewletê ye! Ma hewce dikir ku me ji te re bigota... Qaşo tu merivekî zana, bîrbir bûy! Kê ji te re got ku tu ê nama ji me re bişînî!... Aha were safî bike vêca!

Tu çûy Ewropayê jî, hêj em ji te û bela te xelas ne bûn lo!
Ji bo Xwedê tu careke din xeletiyeke wilo nekî!

Evdella

# XEWNEKE ŞEVA ZIVISTANÊ

«Jiyan ew e ku mirov xwe bigêhîne der.» ev gotinên ramanwerekî ku di pirtûkekê de xwendi bû bi bîr anî bûn, dema ku ji diskotekê derketi bû der û hinek hewa paqij kişandi bû cîgerê xwe. Lê ne navê ramanwer û ne jî navê pirtûkê dihat bîra wî. Û ji nişka ve hate bala wî ku navê dîskoteka ku nuha jê derketiye jî ne li bîra wî ye. Lê hêj bi tenê çend gavan ji dîskotekê dûr bû û dikanî bû li paş xwe vegeriya, li jora deriyê dîskotekê bineriya û lewheya ku bi wir ve dardekirî bû bixwenda. Lewra wusa ne kir, bêyî ku li paş xwe vegere reya xwe domand.

Dunya sayî bû, lê rojtira din berf barî bû û nuha jî bayekî sivik, lê sar, dest pê kiri bû. Lê wî li hember sermayê xwe baş

pêça bû û cihê ku ew ê biçûwayê, istîgeha trênê jî ji wê derê ne dûr bû.

Mîna ku bixwaze zû ji wê derê bi dûr bikeve dilezand. Lê li erdê bostek berf hebû, berf di bin lingên wî de diçû xwarê û ji bo ku neçerixe diva bû ku gavên xwe bi balkêşî bavêtina.

Wexta ku li qiraxa mal û dikanên girtî re wusan li kolanê dimeşiya, li qorziya xaniyekî, li cihekî tarî bi zilamekî ve rastî hevdu hatin. Zilam xwe ji ber da alî û paşê lê vegeriya, bi giramî; «Ezbenî, li pêşiya xwe binêrin wexta ku hûn dimeşin!» got. Lê qet li zilêm ne nerî û bersiv jî ne dayê. Lewra serê wî bi gelek raman û fikrên din ve tijî bû û berî saetekê dixwest xwe bigihîne mal.

Xwe bi xwe: «Mal!» got û beşişî. Gotinên ramanwer ku li ber deriyê dîskotekê bi bîr anî bûn di serê wî re carek din derbas bû bûn. Dîsan xwe bi xwe; «Lê nuha ez mîna keftarekî berî deqeyekê dixwazim xwe bigêhînim hundur, bêdengî û tenêtiyê!» got.

Di vir de dijitiya li ba xwe fam dikir, didît û jê re beyan bû. Ji ber ku eva gelek caran bi serê wî hati bû. Ji hundur, ji ber bêdengî û tenêtiyê direviya. Wê gavê qelebalix û civata mirovan bala wî dikişand û li xweşa wî diçû. Lê dema ku tevî vê qelebalix û civatê dibû, wê çaxê jî ya din dest pê dikir. Bêriya bêdengî û tenêtiyê dikir û vêya jî ne dihişt û rê ne didayê ku xwe baş bi nava civatê de berde û bibe yekî ji wan.

Di gel ku hewl dida da çareyekê ji vê yekê re bibîne jî, dîsa bi ser ne diket. Hewildanên wî mîna vê şevê hemî berteref diçûn. Viya jî ji viyalî de ew bêtir bêhêvî û qudumşikestî dikir. Hewildanên wî tenê dibûn bîrewerî û xewnên naxoş.

Lê ji ber çi wusa ters diçû? Ev pirsa gelek caran ji xwe dipirsî. Lê tu carî jî bersiva vê nikanî bû bida. Te digot qey hemû kes û tişt li hemberî wî ne! Wekî yê îşev ku hati bû li dîskotekê li ser maseya wan rûniştî bû û keçika ku wî kî dizane bê bi çi hal û keşkûriyê dawetî derve kiri bû, jê sitendi bû! «Na!» got. Xwe bi xwe; «wî çima ji min sitend, min ew dayê. Heta min got kerem bike!»

Lê digel ku Martîn... Belê, yê ku hati bû li ser maseya wan rûniştî bû navê wî wusa bû -yekî zerik û bêviltûj bû-, ew hemberî xwe didît jî dîsa heyraniyek jê re raber dida.

Ruyê Martînê bêviltûj qet sor ne bû bû û eniya wî jî xwîdan ne dabû, dema ku ji keçika teniştê re goti bû, «em dansê bikin?» Wê demê wî fam kiri bû ku êdî wenda kir! Û ji ber vê yekê jî tu tişt ne kiri bû û xwe bi xwe; «Na! ji xwe ew ê bertelef ba.» got.

Dansa duyemîn li ber muzîkeke sivik bû. Wî dikanî bû hinekî eccle bikira û berî Martîn keçik rakira dansê, lê ne kiri bû. Bi awureke mîna ku bibê; «Te ya pêşîn kir, tu ya duyemîn jî dikanî bikî!» li Martîn nerî bû. Martîn ji vê awurê razî, berê xwe dabû keçikê û ew cara duyemîn rakiri bû dansê. Dema keçikê ji Martîn re goti bû; «Erê!» awurek mîna ku bibê; «Bi cihenema te kirî!» di wî de vedabû û paşê bi Martîn re rabû bû dansê.

Trêna dawîna şevê gihîşti bû istigehê. Li vagona kêm mirov, li ser qoltixekî bi tenê ciyê xwe girt û tirên bi rê ket.

Çavên wî li qoltixê dawiya vagonê, aliyê hemberî wî ket. Keç û xortekî xwe li hevdu rapêça bûn û hevdu maç dikirin. Yê xort her ku keçik ji lêvên wê maç dikir, hejmarek digot,

«çil û yek... dudu... sisê»

Viya dîsa hişê wî bir ser Martîn û dansa duyemîn. Di dansa duyemîn de Martîn jî xwe wusa li keçikê pêça bû, hêdî hêdî serê xwe nêzî yê wê kiri bû û paşê jî ji lêvên wê maçek sitendi bû. Heta ku dans qediya bû, Martîn hejmara ramîsanan zêde kiri bû. Wexta ku dans qediya bû jî, Martîn devê xwe xisti bû yê keçikê û maçeke nêzî deqeyekê dûdirêj jê sitendi bû.

Xwe bi xwe: «ji bo hinekan jiyan çiqasî hêsan e.» got. Belê, ji xwe ji ber vê yekê bû ku heyranî raberî Martîn dida. Bi keçikê re axaftin, danskirin û maçkirin, evan hemî wusa bi hêsanî kiri bûn ku ew li hember van kirinan behitî ma bû. Lewra evana ji bo wî serketinên gelekî zehmet bûn û incex bi xwîn û xwîdanê dikanî bû pêk bihaniya.

Dema ku ji trênê daket û heta ku gêhîşte malê, derî vekir û kete hundur jî her hişê wî bi viya meşgûl bû û bala wî li ser vê pirsê bû ku; «Çawa hinek -an gelekî merovan- dikanin jiyanê ewçendî hêsan bigirin!» Û paşê heyfa xwe lê dihanî ku ew ne yekî nola wan merovan e.

Li mala wî -ku ji ode û metbexekê pêk dihat- her dever rêşkirî û hertişt paqijkirî bû. Dema ku mala xwe wusa dît, beşişî. Êvarê beriya ku biçe civanê keçikê, bi hêviya ku ew ê wê bîne malê hazirî kiri bû û ne tenê ev jî: Li odê, li ser masê fîndeke li bendî vêxistinê, şûşekek şeraba Bordeux li bendî vekirinê û du piyalên şerabê li bendî tijikirinê amade bûn. Qevdek gulên sor, zer û pembe jî di vazoyeke titik de li ser masê bûn.

Cilên xwe ji xwe kirin û hat mase ber bi qaryola xwe ve ki-

şand, fînda ser masê vêxist, şûşa şeraba xwe vekir, piyala xwe dagirt û; «Merheba ji te re bêdengî û tenêtî!» got û paşê piyala şerabê bi ser xwe de kir.

Cara duduyan dema ku piyala xwe tije şerab kir, beriya ku bi ser xwe de bike, çû seriyê din î odê, ciyê ku teyiba wî lê bû; kaseteke Bethowen da ser teyibê. Ev konsera Bethowen ya piyanoyê bû. Dûre jî hat, ji şerabê dîsa hinek vexwar, paşê xwe li ser nivînan ramedand.

Lê serê wî bi bûyerên şevê ve tijî bû û yek bi yek di hişê wî re derbas dibûn.

Hêj destpêka şevê bû, dema hevalekî wî jê re telefon kiri bû û ew vexwendi bû mala xwe. Lê wî; «Na... îşev civanê min bi keçekê re heye... ez ê şevekê ji felekê vedizim!» goti bû.

Xwe bi xwe; «Lê felekê şevek ji min vedizî, weke hercar!» got û di dilê xwe de hezar nalet û çêr li şans û bextreşiya xwe hanî.

«Belê,» got. «eger ne ji bêşensî û bextreşiya min bûya, dê çima wusa biba? Ew Martînê zerik û bêviltûjik ji kuderê derket? Na, ew xisûsî ji bo min ji malê rabû bû û hati bû dîskotekê îşev. Ji bo ku karê min xera bike û ne ji bo tiştekî din!»

Bi rastî jî heta ku Martîn derneketi bû holê hemû tişt baş û li gor dilê wî çû bû. Helbet ev ne dihat wê manê ku di planê wî yê şevê de kêmasî û qelsî tune bûn. Ya pêşîn di planê xwe de hesabên tiştên ku «ji nişka ve» biqewumin ne kiri bû. Ji xwe ev Martîna jî ji nişka ve derketi bû holê û planê wî serûbinî hev kiri bû.

Lê tiştê ku li zora wî diçû ev bû ku tevayiya salekê di gel ku li nexweşxanekê, li gel keçikê xebitî bû û her roj hevdu didîtin

û bi hev re dipeyivîn jî dîsa cesaret ne kiri bû ku keçikê vexwîne dîskotek an restorantekê. Û wê roja îniyê, piştî nîvro dema li ciyê kar, li oda cixarekêşiyê li gel keçikê tenê ma bû, dîsa bi nîvhenekî jê re; «Ma tu naxwazî bi min re werî ciyekî kêfê?» goti bû. Dûre jî mîna ku sûcek kiri be sor bû bû, xwîdanê di eniya wî re dabû der û hindik ma bû ku ji keçikê bexişîna xwe bixwaze û bibê; «Bibore, min henekek kir!» Lê keçikê beriya wî; «Belê, çima na, pir kêfxweş dibim.» goti bû. Paşê jî li bajêr wext û cî dabûn hevdu.

Xwe bi xwe; «Lê ji bo Martînê bêviltûj nîvsaet ne girti bû ku wê qanî bike.» got û rabû piyala şeraba xwe nû kir.

Lê bi rastî di vir de hinekî neheqî li Martîn dikir, ji ber ku wî ji bo ku rê li ber Martîn bigire tu tişt ne kiri bû. Heta bi bîr anî ku bi tevgerên xwe jî alîkariya Martîn kiri bû. Dema Martîn hati bû li ser maseya wan rûnişti bû, wî dest pê kiri bû û pê re axifî bû û ne dîti bû ku keçik bi madê xwe naxoşiya xwe li hemberî rewşê nîşan dide. Dema ku muzîka dansê dest pê kiri bû, diviya bû wî jî weke adetê keçik rakira dansê. Lê ev yeka ha qet ne li ser bala wî bû û serê wî bi bersiva pirsa ku Martîn jê kiri bû ve meşgûl bû. Martîn jê pirsî bû; «Tu çi karî dikî?» Wî goti bû; «Ez li nexweşxaneyekê dixebitim, li nexweşan dinêrim, xwarina wan didime wan û ciyê wan paqij dikim.» Lewra tenê bi vê bersivê ne ma bû û dest pê kiri bû, planên xwe yên pêşerojê ji Martîn re kat kiri bû.

Bi katkirina planên xwe yên xwendinê dest pê kiri bû. Îsal ji bo xwendinê dereng ma bû, sala bihata wî ê dest bi xwendina lîseyê bikira. Piştî ku salekê wî lîse biqedanda wê çaxê wî ê dest bi xwendina bilind ya asîstaniya doktoran bikira. Bi dû

du salan re dema ku ew jî qedand, wî ê du salan weke asîstanê doktoran kar bikira û paşê jî dest bi xwendina doktoriyê bikira.

Martîn ji hêlekê ve guhdariya wî û ji hêlekê ve jî bala wî li ser keçikê bû û rewşa wê ya naxoş didît. Wî hêj dixwest bibêje ku ew ê çend salan doktoriyê bixwîne, lê Martîn ew fersend ne dabûyê û; «Planên te yên xwendinê gelekî bi rêkûpêk û xweş in!» goti bû, dûre berê xwe dabû keçikê û ew vexwendi bû dansê.

Di vir de xeletiya xwe fam kiri bû, lê êdî dereng ma bû. Herweha ji bo dansa duduyan jî dereng keti bû. Tenê li rêyekê geriya ku qusûrekê bibîne û ji wir bi dûr keve. Di viya de jî wan texsîr ne kiri bûn û alîkariya wî kiri bûn.

Dema ku ji dansa duyemîn vegeriya bûn ser masê, mîna ku keçik pê henekê xwe bike, berê xwe dabûyê; «Tu çima dansê nakî?» jê pirsî bû. Wê gavê devê wî keti bû hev û ne ma dizanî bû ew ê çi bigota; «Ez bawer im, min îşev hinekî zêde vexwar!» got.

Wê gavê jî keçikê zûzûka «Eger tu xwe nebaş hîs dikî, tu dikanî biçî mal.» jê re goti bû. Bi dû van gotinan re, êdî tenê tiştek dima ku bikira û wî jî wusa kir.

Dema ku xatir ji keçikê xwesti bû, hîn jî ew tevgera henekpêkirinê li ser bû. Keçikê bi beşişîn «Gelekî sipas dikim ku te ez îşev vexwendim vê derê.» goti bû. Martîn jî bi tevgereke gelekî ji xwe razî û hinekî jî minetkar; «Gelekî memnûn bûm ku min tu nas kirî!» goti bû. Wî tenê destê wan hejandi bû û ji wir dûrketi bû.

Êdî dawiya şevê bû. Şeraba di şûşê de qediya bû. Betho-

wen notayên xwe yên dawîn lêdixistin û finda li ser masê vemirî bû. Her wusa çavên wî jî hati bûn girtin û êdî xilmaş bû bû.

# TERORÎST

Sal, hezar û nehsed û heftê û yek e; bûyerek ku li gundekî Mêrdînê diqewume rojeva Turkîyê dagir dike û ji hêla raya giştî ve bi baldarî tê taqîpkirin.

Li gor agahdariyên rojnameyan li vî navçeyî terorîstek peyda bû bû. Lê, dîsa li gor şiroveyên wan ev terorîstekî gelkî xweser bû û bi tu diruvê teroristekî din ve ne diçû: di dîroka Turkîyê de ku ji vê hêlê de zengîn bû, heta nuha mînakên wusa ne hati bûn dîtin. Rojname zêdetir li ser metodên wî disekinîn û digotin; «Ew metodên ku terorîst bi kar tîne taybetî ne! Ew êrîşên xwe bi şevê, dema hîvtarî ye dike. Û heta nuha jî ew êrîşên xwe li ser leşkerên ku harisê tixûbê Sûrîyê ne dike. Gelekî balkêş e ku heta nuha vî terorîstî hêj fîşek ne te-

qandiye. Tenê di tarîtiya şevê de ew digire ser kozikên leşkeran û ji nişka ve wan diqutifîne. Bi vî babeti heta nuha sê leşker şehît xistine!»

Lewra rojnamevanê ku ev nivis nivîsî bû, hezar caran poşman bû ku çavên xwe li vê dunyaya fanî vekirîye û şîrê diya xwe mêtiye! Ji ber ku ordiya tirk eva li xwe weke heqareteke mezin qebûl kir û bi çeplê rojnamevan girtin, ew avêtin zindanê û ji wê rojê û vir de ji vî rojnamevanî kesekî tu salox nema hilanî!

Paşê jî serokgeneralê ordiyê xwe mecbûr dît û di radyo û televizyonê de gotarek da; di gotara xwe de got ku: «Mehmetçîk ji tu tiştî û tu kesî natirse! Yên ku terzî vê dibên xayînên milet û dewleta me ne!» Bi dû de jî ferman da ordiyê ku çi pêwist be bikin, ji bo ku vî terorîstî sax an mirî bi dest bixin. Ji bo vê vatiniyê jî tabûrek qumando rêkirin navçe.

Tabûra qumando di navçe de dest bi operasyonan kir û piştî çend rojan jî netîce girt: statîstîka operasyonan, çar gundên şewutî, panzdeh zilamên ku bi işkencê seqet ma bûn û sê sed gundiyên girtî bûn.

Gundiyan hewar û gaziya xwe gihandin nûnerên xwe ku di parlamentoyê de bûn. Nûneran ji gundiyan re gotin ku ew ê nikari bin tu sozê bidine wan, ji ber ku eva meseleke leşkerî bû. Lê dîsa jî tiştê ku ji destê wan bihata ê bikirana, diva bû şika gundiyan ji vê yekê tune ba, ji ber ku aha dîsa wexta hilbijartinê bû û pêwistiya wan gelekî ji dengên gundiyan hebû.

Rîsipiyên gundiyan hêj li Ankarê, li hêviya bersiva parlamenterên xwe bûn, dema ku ji navçe saloxên xêrê bihîstin. Parlamenterên ku ne dixwestin xwe bi carî gundiyan bixin, bi

dû van saloxên xêrê re, hatin xwe zûzûka gihandin gundiyan û gotin ku hukûmetê bi ya wan kiriye û loma ev operasyonana hatine rawestandin. Lê heqîqet helbet bi babetekî din bû, ji ber ku hemû gundên navçe para xwe ji van operasyonên tabûra qumando girti bûn.

Di wê navbênê de êrîşên "terorist" jî rawestiya bûn. Lê herkesî eva bi hilatina hîvê ve girê dida û digotin: «Dema ku dîsan hîvtarî bibe ew ê terorîst dest bi êrîşên xwe bike!»

Bi rastî jî ew her her panzdeh şevên ku tava hîvê bû, tu deng û salox ji terorîst derneketin. Û heta bi dû hersê şevên ku hîvtarî bû jî tiştek ne qewumî. Lê şeva çaran terorîst dîsa êrîşek biri bû ser wan û di vê êrîşê de leşkerekî din kuşti bû. Sibehê dema ku kontrol çû bû ser kozikan, ji bo ku harisan biguhere, leşkerek di kozika wî de mirî dîti bûn. Karbidestên leşkerî zû dest danîn ser vê meselê û ne hiştin ku di vê derbarê de tu înformasyon belav bibe.

Lê eger ne bi tevayî bûya jî dîsa di rojnameyan de hin salox belav bû bûn. Li gor van saloxan MÎT'ê di derheqê vî terorîstî de hin agahdarî bi dest xisti bûn û hêvî dikirin ku di wexteke kin de ew ê wî bigirin.

Piştî çend rojan di hemû rojnameyên Turkîyê, di bergê pêşin de, xeberek hebû; «Terorîst girtin!» Û li bin vê xeberê jî wêneyek hebû. Di wêne de, zilamekî navsere bi rî û şaşik li ber kerekî rawestiya bû. Li gor saloxên rojnameyan, terorîst heta nuha êrîşên xwe li ser vî kerî dikirin. Di êrîşa dawîn de, şopa ker hati bû derxistin û çend şopgerên jêhatî şop gerandi bûn û terorîst li mal, li gel kerê wî zeft kiri bûn. Heta digotin ku ew di amadekirina êrîşin nû jî de bû...

Wê rojê li Turkîyê, êdî li sûka reş jî rojname peyda ne dibûn. Ew kesên ku di jiyana xwe de qet rojname ne kirî bûn û ne xwendi bûn jî çû bûn rojnameyek sitandi bûn. Rojtira din gelek rojnameyan çapa xwe ducar kiri bûn.

Bi dû çend rojan de hate famkirin ku yê wekî terorîst hatiye girtin melayê gundê P'yê ye. Mela herçendî goti bû ku bêguneh e, dîsa jî keseki jê bawer ne kiri bû. Dadistên di derheqê mela û kirinên wî de dosyek ji du sed rûpelî amade kiri bû û ji bo mela tawanê herî giran, dardekirin xwesti bû.

Rojnamekê jî di derheqê mele û jiyana wî ya terorîstî de lêkolînek çêkiri bû û eva perçe bi perçe her roj çap dikir. Li gor saloxên rojnamê têkiliyên mela bi Ermenîstan û Yewnan re jî çêbû bûn û ji van dewleta pere distandin, ji bo ku li Kurdistanê serhildanekê li darxe û Turkîyê perçe bike. Rojekê jî rojnamê secereya bav û ejdadên melê weşand û bi vê riyê mele hate agahdarkirin ku di eslê xwe de ew ne ji Neqşebendiyan, lê ji Bedirxaniyan e; bavê wî û Emîn Bedirxanê ku mîrê kurd yê dawîn bû pismamên hev bûn. Wekî din jî xezûrê bavê melê di serhildana Şêx Saîd de beşdar bû bû. Rojnamê lê zêde dikir û digot ku; «Mele li pey heyfa bav û kalê xwe ye!»

Mele di rewşeke xirab de bû û dizanî bû ku şensê wî tuneye, ji bo ku bikari be bêgunehiya xwe îspat bike. Hemû kesî û hemû tiştî li dij wî digot! Di rewşeke wusa neçar de, mîna hemû mirovên dîndar melê jî li ocaxên xwe, yên mîna Şêx Evdilqadirê Geylanî, kire hewar û gazî û li hêviya deriyekî xêrê ma.

Piştî demekê, di wexteke ku mehkemeya melê nêzîk dibû û hêviya wî kêm bû bû, te digo qey ocaxên melê dengê wî bihîs-

ti bûn û di hewara wî de hati bûn. Ji ber ku dîsa leşkerek li ber tixûb di kozika xwe de mirî hati bû dîtin. Ew jî mîna yên din navqetî bû bû, lê bi şêwê fermî digotin ku "hatiye fetisandin". Lê ya baş ji bo melê ew bû ku li ser kozika yê leşker şopa pîkola kerekî hati bû dîtin. Eva delîleke xurt bû ku terorîst hêj ne hatiye girtin. Ji ber ku kerê melê weke unsûrekî tawanê melê li hêviya mehkemeyê, li axurê belediyê girêdayî bû.

Piştî vê bûyerê karbidestên leşkerî yên heremê biryar dan ku wan kesên xwedî ker in teva bigrin bin çavan. Bi dû vê fermanê re li heremê bi hezaran kerên bêxwedî û beradayî bi çolê de terqiya bûn! Lê di vê navbênê de tabûra qumando jî dest bi operasyonên xwe kiri bû. Di operasyonan de kerek li kuderê didîtin ew gulebaran dikirin û dikuştin. Bi vî babetî wan dixwest rê li "terorîst" teng bikin.

Wusa hêj qumandoyan kuştina keran didomand û ji nişka ve vê bûyerê rengekî navnetewî girt. Ji ber ku çend wêneyên kerên gulebarankirî di rojnameyên Ewropî de jî çap bû bûn. Van wêneyan tesîra xwe li hîsên Ewropiyan yên ji vî alî de nazik, kiri bûn û dilê teva şewutandi bû. Loma jî hemû komikên heywanparêz seferber bû bûn û bi riya Konseya Ewropî dewleta Turkîyê protesto kiri bûn. Di protestoyê de xwestinek jî hebû ku Turkîyê divê problemên xwe yên etnîk bi riyên demokrasiyê hal bike.

Serokwezîrê Turkîyê, Cengîzxan Selçûkê ku heta nuha xwe di qultixê xwe de giran kiri bû û ne xwesti bû van bûyeran şirove bike, rabû di televizyonê de axaftinek kir. Di axaftina xwe de, serokwezîr, weke welat serxwebûna Turkîyê parazti bû û goti bû ku; «Mafê welatên din tuneye ku têkilî karên

Turkîyê yên hundurîn bibin. Dewlet him li mirovê xwe dixe û him jî ji wan hez dike, eva kesekî din eleqedar nake! Ya din jî li Turkîyê tu meseleke etnîkî tuneye. Ew tirkên ku weke kurd tên nasîn li Turkîyê hemwelatiyên di dereca yekemîn de ne! Lê li welatê me li vê herema paşmayî, meseleke terorê heye. Di eslê xwe de evana Ermenî ne û ji Yewnan jî alîkariyê werdigrin ji bo ku welatê me perçe bikin. Lê dewleta me bi hêz e û ew ê vê meselê çareser bike. Û di vê çareserkirinê de jî dewlet û qewetên leşkerî ê tu carî jî ji prensîbên demokrasiyê dûr nekevin, bila şika tukesî ji vê çênebe! Ewropî dibên hêzên leşkerî ker gulebaran kirine, eva jî ne rast e û propaganda terorîstan e; tenê li cihekî erebeyek leşkerî li binguhê kerekê ketiye û ev kera mirîye, lê eva tenê qezeyek e û qezên wusa li Ewropa jî çêdibin!» Bi dû axaftina serokwezîr re, li Turkîyê minaqeşa li ser terorê û talûka perçekirina welêt gurr bû bû. Rojnameyan her roj li ser têkiliyên terorîstan ku bi Ermenî û Yewnan re hebûn, dinivisîn. Li gor saloxên rojnameyan; heremên rojhilat tijî çek û cepxane bû bûn, bi gotineke din digotin; «Bûye kodika barûdê! ha diteqiya, ha diteqiya!...» Heta rojnameyekê nivisî bû ku «Dehlîzek binerdê di navbêna Agirî û Êrîvanê de hatiye tespîtkirin û çekên ku hatine welêt hemû di vê dehlîzê re derbas bûne.» Lê çend roj şûnde hate famkirin ku eva ne tu dehlîz, tenê şikeftek bû!

Di hengameyeke wusa de rojekê serokgeneral derket di radyo û televizyonê de gotarek da. Got ku: «Terorist ê pêşiyê di ser cenazê min re derbas bin û paşê vî welatî perçe bikin!» Bi dû vê gotarê re hêj çend roj ne buhurî bûn û generalan hemû hikum kirin destê xwe.

Rojekê di televizyonê de xeyala zatê serokgeneral û çend qumandanên wî xuya bûn. Bi dû bêhnikeke bêdeng re serokgeneral şekirek şikenand û dest bi axaftinê kir: Di axaftina xwe de da famkirin ku parlamento fesex kiriye û serokwezîr jî avêtiye zindanê. Paşê jî da famkirin ku ew ê ji bo demekê him serokwezîr û him jî serokkomar be. Lê dîsa jî ji bo ku şaş neyê famkirin ê kincên leşkerî ji xwe nekirana!

Eva dihate wê manê ku hemû tiştên çapemenî û weşanî dikete bin kontrola hêzên leşkerî. Ji ber vê yekê jî tu salox û agahdarî di derheqê bûyerên ku li vî navçeyê Mêrdînê dibûn, nema gihişt raya giştî û heqîqeta vê meselê ji xelkê veşartî ma. Hêzên leşkerî bi carekê perdeyek kişandin ser vê meselê û bi vî babetî mesele tefandin.

Lê dibên, zeman hakimê adil e û eva gelekî jî rast e. Ji ber ku beriya demekê pirtûkek lêkolîner û kurdnasê Rûsî Îskenderovê Baba çap bû bû. Di vê pirtûkê de Î. Baba, çend nivîskar û şaîrên kurd yên vê demê jî, li gel berhemên wan dide nasîn. Ji herema Mêrdînê jî behsa nivîskarekî bi navê "Xwînherê Kurdî" dike. Î. Baba heyfa xwe lê tîne ku di derheqê jiyan û navê vî nivîskarî yê rastîn de, tu agahdarî bi dest ne xistiye. Tenê çend nivîs û şiirên vî nivîskarî ku bi dest xistiye, di pirtûka xwe de weşandiye. Xwînherê Kurdî, di bin sernivîseke; «Ji nifşê ku bê re!» bûyerên wê demê jî kat dike û rastiya li paş van bûyeran bi vî babetê jêrîn şirove dike:

«Eva serê demekê ye ku zilm û zordariya dewleta tirk û hêzên wê yên leşkerî, li vê navçeya me bêhawe zêde bûye. Heta nuha pênc gundên nêzî xeta tixûbê Sûrîyê bi carekê ve şewutandine; bi sedan gundî bê sedem hatine girtin û işken-

cekirin. Dewlet ji gundiyan re dibê "hûn terorîstan vedişêrin û ev terorîst bi şevê digrin ser kozikên leşkeran û wan difetisînin!" lê heqîqeta meselê ne wusa ye.

Li gundekî navçe kerekî bêxwedî hebû û eva hertim li nêzî xeta tixûb ji xwe re diçêriya. Ez nizanim bê ji ber çi sedemê bû, lê vî kerî qet ji leşkerên tirk hez ne dikir û li kû didîtin êrîş dibire ser wan. Eva carekê min bi çavên xwe dît. Rojekê leşkeran bi tirumpêlekê girtin ser gund ku saxtî bikin. Dema ku leşker li nav gund belav bûn, min dît ku ev ker nêzî tirumpêla wan bû û bi zîtirkan herdu lempeyên wê yên pêşîn şikenandin. Bêşik yê ku bi şevê jî êrîş dibire ser wan ev kera bû û di êrîşa dawîn de jî şehît ket!

Di wexteke ku mêrê kurd bi xwe li doza xwe xwedî dernedikel, kirinên vî kerî ji bo min serefrazîyek bûn û ez bi kirinên wî dilşa dibûm û bi mirina wî jî gelek êşiyam. Ez ji nifşê ku bê, hêvî dikim ku kirinên vî kerî ji bîr nekin.»

Eger ne ji Xwînherê Kurdî ba, ê rastiya vê bûyerê jî mîna gelek bûyerên din, di tarîtiya dîroka me de winda bibaya. Herweha ji xeyn vê nivisê Xwînherê Kurdî bîrewerîya vî kerî bi şiireke xwe jî aniye zimên, berî ku ez li vir niqteyekê deynim ez wê şiira Xwînherê Kurdî jî pêşkêşî we dikim:

## KERÊ BI NAMÛS

*Bi tarîxa heftê û yekê hîva dehan bîst û yekê*
*Li serxetê li ber qelêç leşker girt dora gundekî*
*Wîsa neyar wisa dijmin tifing dagirt ji fîşekê*
*Şevek reş î pir tarî bû saet li duwanzdeh û yekê*
*Kerek hebû qut î kem bû him jî kor bû bi çavekî*

*Rengê wî reş qama wî kin umrê wî li dor çar û yekê*
*Beradayî bêxwedî bû kesî ne dihewand malekê*
*Bi namûs û pir zana bû û zû neyaran nas dikî*
*Him fêris û qehreman bû çêtir ji şêr û fîlekî*
*Wî leşker dît li ber benê hema bi lez hicûm dikî*
*Bi zirzirê û qorqorê leşker li erdê dirêj dikî*
*Paşê li ser pîkolê dikî*
*Qudûm şikest nav qetiha bi ser de mîza zer dikî*
*Navê wîya Dûrmîş bû û navê bajarê wî Hendekê*
*Qumandan hat ser lê nerî dît ew çawan sikratê dikî*
*"Eywah oglum şehit duştun" ker jî zir zira xwe dikî*
*Gundî civand zirta dikî wana davêje feleqê*
*Temo weke mêran qîrek dayê tu çi dawê li me dikî*
*Qutifîye leşkerê te ji kerê qut î kem bi çavekî*
*Rabûn bi lez leşker civand wîna davêjin cemsekê*
*Berî bighin nexweşxanê can da nema çav bel dikî!*

# SERÛPÊ

Gemşo wexta di deriyê hewşê re derbasî hundur bû, pîreka wî, Nûrê ji mêj ve tifik amade kiri bû. Beroş, textik û kêra xwe jî li ber tifikê danî bû. Ji mêrê xwe re; «Qewet be ji te re!» got û telîs ji destê wî girt. Gemşo, tenê got; «Divê ez bi lez destlimêja xwe bigirim ku bigihim nimêja nîvro bikim.» Paşê jî rast çû hundurê odê.

Nûrê li keça xwe ya mezin qêrîya ku ji bavê xwe re misîn tijî av bike. Bi dû de jî bi kêf û zûzûka devê telîs vekir. Bi vekirina devê telîs re bîhna serûpê û hinekî jî ya hûr li hewşê tevî belav bû.

Bîhn ê çû be kûçikê malê Beşo jî, ku ji ser sergo bi lez hate hewşê, li ber Nûrê sekinî û teriya xwe livand.

Pisîka malê jî ji sibê de li axur, li mişkekî ku ji nav lepên wê reviya bû digeriya, lê heta nuha jî hêj zeft ne kiri bû. Pirr jî birçî bû bû. Gava wê jî bîhna serûpê kir; dev ji lêgerîna mişk berda, rast xwe li bîhnê girt û hat...

Lê bi hatina xwe pirr poşman bû. Bi zora heft belan xwe ji nav lepên Beşo xelas kir. Bi şûnde çû axur, dîsa li mişkê xwe geriya. Lê bi hatina xwe qismetê Beşo jî birî; Nûrê hêrs bû, kevirek li newqa Beşo da û ji hewşê berdayê.

Nûrê ser û lingên mîhê li ser argûn qene kizirandin. Dûre jî li ser textik bi kêrê baş xeritandin; serê mîhê jî ji hev ali kir û gazî keça xwe kir ku avinê bîne ji bo serûpê bişon. Ev karê han di wexteke pirr kurt, weke nîv saetê de xelas kir. Tenê kelandina wî ma bû...

Lê hêj hûr û roviyên mîhê li wir, ne paqijkirî bûn. Çendî wext diçû, di bin germiya royê de bîhna wan pîs dibû. Nûrê hûr û roviyên mîhê xistin teşteke naylon, li pişta keça xwe kir û ew şande ser kaniyê da wan li wir bişo. Bi vî awayî jî ji bo şîveke din jî haziriyên pêşin hati bûn kirin.

Nûrê çû kîlerê, legana xwe ji kîsê birxul nêvî kir û vegeriya hewşê, li ser dikê rûnişt û dest pê kir gûmişk û hin tiştên din ku ji birxul ne dihatin hesibandin neqandin.

Heta wê çaxê herdu zarokên wan ên biçûk jî ji nav gund hati bûn malê. Herdu çûn li tenişta diya xwe rûniştin û alî wê kirin.

Gemşo wê rojê bêkêf xuya bû. Nûrê di bêkêfiya mêrê xwe derxisti bû, lê nizanî bû ji ber çi ye. Ji wexta ku hati bû bi kesekî re ne axifî bû. Digel ku dunya hênik bû bû jî ew hêj di hundur de bû. Nûrê di dilê xwe de digot; «Hewaleke vî mêri-

kî heye!... lê ka çi?...»

Dunya bû bû êvar, wexta xwarina şîvê bû. Nûrê sifre amade kiri bû; girar tev xisti bû leganekê û goşt jî danî bû ser. Lê Gemşo hêj ji odê derneketi bû. Dûre Nûrê çû hundur ku gazî bikiyê da were şîvê bixwe.

Gemşo li hundirê odê, li ser tejikekî, serê wî li ser balgihekê ramedandî, difikirî. Nûrê; «Çi hewala te ye? Çima tu wusa bêkêf î? Xwedê neke, qey tu nexweş î?» pirsî. Gemşo, hinekî bi xeyd; «Na! Ez ne nexweşim; dev ji min berde!» got. Nûrê hinekî bi tirs; «Ez xwarina te bînime vir?» got. Lê Gemşo; «Na! Dilê min nuha naçiyê; pariyekî ji min re hilîne.» got.

Nûrê bi şûn de vegeriya cem zarokan; lê çi bibîne! Herdu zarokên biçûk, bi kevçiyên xwarinê dikin ku serê hevdu bişkênin. Her yekî bi aliyekî zimanê mîhê girtîye û bi alî xwe de dikişkişînin. Ew dibê; «Ziman para min e!» û yê din dibê; «Na, ya min!...» Eger ku diya wan ne goti bûya; «Ziman para bavê we ye!» dê şerekî mezin di navbêna herduyan de derketa. Lê wexta ku gotinên diya xwe bihîstin; dev ji hevdu berdan û dest bi kevaştina herdu lingên mîhê, ku para wan keti bû, kirin.

Gemşo heta ku dunya tarî bû di hundur de ma. Lê vî çilê havînê, germ û wexma hundir ne dihat debarkirin. Dûre rabû ser xwe û çû ser ban, li ser nivînan xwe direj kir.

Piştî ku Nûrê sifre da hev û zarok tev kirin xew ew jî hate li ser nivînan, li tenişt mêrê xwe rûnişt. Gemşo jî paldayî cixarek pêxisti bû, hêdî hêdî lê bi hilmên dirêj dikişand. Nûrê xwe ne girt û pirsî; «Ev îro bo çi tu wilo bê kêf î?» Gemşo zîvirî ser pîreka xwe, awirek tê veda; «Ma ez dê çawa bi kêf bim,

ma xelk dihêlin!» Nûrê; «Çi karê me ji xelkê xera bû ye?» Gemşo keserek veda û hinekî bi qehr; «Çawa çi karê me ji xelkê xera dibe? Çavên xelkê bi vê pariya nanê ku em dixwin bar nabe!» Nûrê; «Çi bûye? Qey te û hinekan rahiştiye hevdu?» Gemşo hilmeke dawîn li cixara xwe xist, qunka wê bi erdê ve perçiqand, paşê; «Ev segbavê Ehmedo; ev serê mehekê ye li dû çawîşê qereqolê digere ku qesabiya qereqolê ji min bistîne. Îro jî girûzak pakêtên "samson" di dest de hate cem çawîş û pistepista wî bû pê re diaxifî.»

Wexta wusa got, madê Nûrê bi carekê guherî. Ev serê salekê bû rewşa wan ya aborî bi qesabiya ku mêrê wê ji qereqolê re dikir hinekî pak bû bû. Gemşo ê heftê rojekê biçûya ji leşkeran re pezek bigura û heqdestê vî karî jî dê ser û hûrê pez bigirta.

Berê ji du mehan carekê goşt dixwarin an ne... Lê nuha li ser sifra wan her heftî goşt peyda dibû. Sifra wan bi karê qesabiyê hinekî dewlemend bû bû.

Li gund ji du cot erdê wan pê va tiştekî wan yên din tune bû. Herdu cotên erd jî debara wan ne dikir. Herweha serûpêyê ku mêrê wê dihanî, her ji du heftiyan carekê difrot gundiyên din û bi van peran jî kêmasiyên xwe yên wekîdin dibuhurandin. Bi kurtî, ji bo wan qesabiya qereqolê gelekî girîng bû. Ji dest derketina vî karî malxerabî bû. Li dunyayê hertişt dibû lê ev yeka ê neba!

Nûrê bi dengekî nîvxeniqî: «Tu çêl Ehmedê me yê Fatimê dikî?» Gemşo; «Na, na! Ev ji gundê Çavnebarê ye. Ne weke me feqîr e jî; zêdî du sed donim erdê wî jî heye.» Nûrê; «Weyla şeş top li malê keto!... Digel ku xwediyê evqas zevî

ye, hêj çavên wî li hatina serûpêyekî pez e jî...» got û di dilê xwe de hezar nifir lê kirin.

Heta derengî şevê jî herdu li ser nivînan dirêjkirî, hişyar bûn. Dûre ji hejmartina stêrkan çavên Gemşo westiyan, bêhemdî xwe xilmaş bû û di xew re çû. Nûrê jî bi dû mêrê xwe de bi saetekê, ew jî bi zor di xew re çû.

Tiştên ku Nûrê di xewna xwe de dîtin pirr tevlihev bûn: Gelek caran li cem zarokan û hinek caran xwe li cem mêrê xwe didît. Carekê jî li ser kaniyê wexta ku serûpê paqij dikir; kûçikek bi dizî dihat, serê xwe dikire teştê, serê mîhê dikir nava diranên xwe û direvand. Nûrê wexta ku didît kûçik serî direvîne, wê jî nemerdî ne dikir, dawa xwe dikir devê xwe û rast dida dû... Kûçik ew li nava gund tevî digerand. Dûre wexta didît Nûrê ji dû venagere; berê xwe dida qelêç û direviya lê wê jî dida dû. Di xewna xwe de heta berbanga sibê Nûrê her li dû kûçik bû. Sibehî wexta ji xew rabû bû, ew jî li xurtbûna xwe ya şeva din ecêbmayî ma bû!

Lê xewna ku Gemşo dît pirr zelal bû; Gemşo wê rojê ji paleyê dihat. Gelekî birçî û westiyayî bû. Li vegerê, pîreka wî serûpêyê ku Gemşo doh anî bû malê, çêkiri bû. Nûrê sifrê li ber mêrê xwe amade dike. Gemşo tu kêmasî di sifrê de ne dîtin. Serê mîhê yê kelandî li ser legana miştgirar bû. Herdu ling û ziman jî li dora serî bûn; Nûrê pîvaz û nan jî ji bîr ne kiri bûn, ew jî danî bûn ser sifrê. Wexta ku Gemşo sifre wusa dît, av bi devê wî ket û bi lez destê xwe dirêjî serûpê kir. Lê destên wî çûn valahiyê. Sifre, fena ku yek ji ber bikişîne bi dûr diket. Gemşo, bi qûnkişkê bi dû sifrê de çû. Lê ew çiqasî ku diçû sifre hîn bêtir bi dûr diket. Gava ku serê xwe bi jor de

kir, çi bibîne! Ehmedo ye yê ku sifre girtiye û ji ber direvîne. Ehmedo tevî sifrê di derî re ji hundur derket. Gemşo jî da dû; lê li devê derî leşkerekî singuwa xwe dixist sînga wî û ew paşde didehfand. Gemşo bi piştê ve li erdê ket û ji xew çemd bû.

Wexta ku Gemşo hate ser hişê xwe dît ku ji ser nivînan gindirîye erdê. Gemşo rabû ser xwe eşheda xwe anî, wê çaxê fam kir ku pirr birçî bûye. Rast çû merkeb hilda, xwarina ku pîreka wî jê re hilanî bû xwar.

Sibehî, Gemşo pîreka xwe şand dikana Çelo ku girûzak pakêtên "samsom" bîne. Nûrê li mêrê xwe nerî û got; «Kuro! Girûzak pakêtên "samson" dinyake pere dike! Tûtina te heye tu çima wê nakişînî?» Gemşo serê xwe hejand; «Keçê tu dîn î! Ez ê çawa pakêtên "Samson" ji xwe re bikirim! Ma ez axe me, an jî milyonên min hene! Heftiya ku bê ez ê ji çawîşê qereqolê re bibim ka bê hinekî dilê wî xweş nakim, ji bo qesabiyê ji dest min dernexe.»

Berî ku Nûrê di deriyê hewşê re derkeve, Gemşo li pey qêrîya; «Ku Çelo bixwaze, di bedêla pakêtên wî de em ê serûpeyêkî bidinê; tu wusa jê re bibê.» Nûrê; «Ez kefîlê te ku wê qayîl bibe û ku em bixwazin, ew ê di ser de hinek pere jî bide me. Serûpêyek hêja ye du girûzên pakêtên "samson".» got û çû.

Heftîkê şûnde, roja çarşemê bi berbanga sibê re Gemşo ji xew rabû. Limêja xwe kir û xwe girêda ku biçe qereqolê. Ev roja gurandina pez bû. Bi parîk nan û tasek av xurîniya xwe şikenand û girûza pakêtên xwe xiste bin çengê xwe û riya qereqolê girt.

Bi meşê ji gund heta qereqolê nîv saet digirt. Gemşo gavên xwe mezin kirin û lezand; diva bû dereng nemaya.

Gemşo zû gihişt qereqolê. Wexta di deriyê hewşê re derbas bû hundurê bexçê qereqolê dudilî bû. Nema dizanî bû ew ê pêşiyê biçe cem çawîş pakêtan bidiyê, an biçe karê xwe xelas bike û dûre here cem... Hêj wusa diramiya, ji nişka ve dengekî ew di cihê wî de ricifand. Gemşo ev deng zû nas kir; wexta dikir pez serjê bike ev denga dibihîst. Ev barîniya mîheke ku ew ê serjê bibûya. Bi alî koza ku pez lê digurandin ve bazda; wexta ku gihişt nêzîkî kozê di cihê xwe de mat ma! Çi bibîne! Leşkerekî mîh girêdaye û li ber sekinî ye. Ehmedo jî berdilka qesabiyê ku hêj bîhna xwêdana Gemşo jê ne çûye, li xwe kiriye û kêr di dest de bi mivredê tûj dike. Ehmedo dema ku Gemşo dît, beşişî û bi alî mîha dikire maremar ve çû.

Dema ku Gemşo dît yek bi hêrs, bi ser de diqîre hate ser hişê xwe. Çawîş li ber rawestî ye û bi tirkî dibê: «Tu kerr Bûye! Ev çar car in ku ez bang te dikim.» Gemşo, bêyî ku awirên xwe ji ser Ehmedo û mîhê dagerîne, ji çawîş re got; «Min bibexşîne begê min! Min dengê we ne bihîst.» Çawîş girûza pakêtên "samson" di bin çengê Gemşo de dîti bû. Çawîş; «Kuro! Bi Xwedê tu merivekî merd î. Tu naxwazî di bin qenciya kesekî de bimînî.» û bêyî ku Gemşo pakêtan bidiyê wî bi xwe destê xwe dirêj kir, girûza pakêtan ji bin çengê wî derxist. Çawîş; «Te ev ji bo min anîne, ne wisa?» Gemşo; «Belê, min ji we re anî...» Lê hêj gotina xwe xelas ne kiri bû, Ehmedo kêr da qirika mîhê. Destên Gemşo bêhemd çûn ser qirika wî; te digo qey Ehmedo ne qirika mîhê, ya wî dibire. Gemşo xwest ji çawîş re tiştekî bibê lê çawîş ji wir bi dûr keti bû. Ne-

ma dizanî bû dê çi bike?

Hertişt vekirî bû; ji îro û pêve Ehmedo qesabê qereqolê bû. Tiştê ku bi tenê hate bîrê, ev bû ku ji wê derê berî deqeyekê bi dûr bikeve û wusa jî kir.

Bi riya malê de Gemşo ne dixwest ku tiştekî bifikire, lê deynê Çelo, yê pakêtên "samson" her li bîrê bû.

# DILÊ DÊ

Li quncikekî odê rûniştî bû û teşîya xwe dirist. Lê hiş û bala wê li ser aliyê din yê odê bû. Li wir, li ber têna agirê sobê, li bin lembeya gazê, ku hundurê odê nîvronî dikir, rûniştî bû. «Berxê» wê, belê wê hercar lawê xwe wisa bi nav dikir, jê re «Berxê min!» digot. Bi bavê xwe re sohbet dikir.

Ev serê çend mehan bû ku ne hati bû malê. Li bajêr xwendekar bû, lê her meh ew ê carekê bihata gund û bavê xwe zîyaret bikira, tişt û xwarin bi xwe re bibira û dîsa vegeriya bajêr. Lê hersê mehên dawîn qet ne hati bû û kesekî jî salox jê hilneda bûn. Ji bajêr jî saloxên naxoş gihişti bûn gund. Goti bû; «Xwendekar û polîsan li hev dane!» Neba ku «Berxê» wê jî di nav wan de ba? Wê jî zor dabû bavê da biçe bajêr «Ber-

xê» wê bibîne li hal û rewşa wî bipirse.

Beriya heftiyekê bû; hêj bav wisa di haziriya çûyîna bajêr de bû dema ku «ewana» hati bûn. Eva elametekc ne baş bû. Bi cemseyekê hati bûn, bi qasî sîh kesî bûn û hemî jî bi çek û rextan pêçayî. Dora xaniyê wan girti bûn û qul bi qul li hundur geriya bûn. Paşê jî bav girti bûn çend buks û şeqam pê ve kiri bûn, rebeno bêhal li erdê dirêj bû bû. Paşê jî bi berstika wî girti bûn û jê pirsî bûn; «Lawê xwe derxîne! Em dizanin ku tu wî vedişêrî û eger tu ne kal ba me ê tu li şûna lawê te bibira!» goti bûn û hezar gotin û çêren nexweş jî jê re kiri bûn.

Wê xwe gihandi bû serokê cendirman û jê re; «Efendî, ji bo çi hûn li lawê min digerin? Ma çi kiriye? Lawê min xortekî gelekî delal û dilbirehm e. Eger hûn wî binasin kêfa we ê gelekî jê re bê!» goti bû. Lê serokên cendirman dehfek dabûyê û bi hêrs, bi tirkî axifî bû. Wê tenê gotina ku «Lawê te terorîst e!»» fam kiri bû. Lê ji vê gotinê jî mana «Terorîst» nizanî bû. Ew jî çi bû? Lawê wê hêj xwendekar bû û tu dibistanên bilind ne qedandi bûn. Lê ji vê bêja «terorîst» wisa xuya dikir ku cendirme pir aciz bûn.

Paşê ji bavê pirsî bû; «Terorîst çi ye?» Wî jî; «Yên ku li hemberî dewletê radibin û berberiyê bi polisan re dikin» goti bû.

«Ji bo çi?» pirsî bû. «Lawê me ê çima bi polisan re berberiyê bike? Ji bo çi ew û dewleta Elî Osman ê têkevin pêxîla hev?» Lê bavê jî baş nizanî bû. Gerçî vê sala dawîn hin guhertinên li ba «Berxê» xwe dîti bûn. Gelekî behsa feqîrî û Kurdistaniyê dikir. Dayê digot; «Wê wextek bê... ê welatek ava bibe û hemû kes ê weke hev bin. Neheqî ê rabe!» Wê jî

goti bû; «Berxê min, tu behsa dema ku Mêhdî ê rabe dikî. Eva di quranê de jî heye. Wê gavê ê gur û mih bi hev re biçêrin!» «Berxê» wê; «Na, dayê ez ne behsa Mêhdî dikim. Vî welatî em ê bi xwe ava bikin. Gelek welatên wisa jî li dunyayê hene.» goti bû.

Îşev hati bû malê, ew jî bi dizî hati bû. Dema ku çû bû dewaran êm bike, ew dîti bû. Li hewşê li ber sêncê bû; «Dayê, dayê...» goti bû. Dengê «Berxê» xwe zû nas kiri bû. «Berxê min tu î... li ber vê sermeya zivistanê tu çawa disekinî? Tu ê nexweş bikevî dilê diya xwe!» goti bû û ew hemêz kiri bû û anî bû hundur.

Bav jî behîtî ma bû dema ku ew dîti bû. Lê tiştek li xwe çênekiri bû. Dilê bavan qewî ye, ne mîna yê dê tenik e. Mîna ku tiştê «Berxê» wê kiri bû ne ecibandi be; «Te dît bê te em xistin çi pirikê! Dijminiya dewletê ji me re zêde bû!» goti bû. Paşê jî çû bû, çifte û rextê xwe derxisti bû, li ber pacê rûnişti bû û; «Ji sed bavê xwe bê minet in, bila werin!» goti bû.

Teşiya xwe dirist, lê bala wê li ser «berxikê» wê bû. «Çi zeîf bû bû... diya te bi qurbana te be lawo!»

Ew jî çi bû? Bavê şîret lê dikirin û behsa deverna dikir. «Binxetê, ba hevalên xwe...» «Berxê» wê ê bi kû de biçûya, bi kû de biterqiya...

Teşiya xwe berda û hat li ba «berxê» xwe rûnişt. «Lawo tu ê bi kû de biçî? Li malê bimîne, diya te ê herşev nobedariyê li te bike. Ka em binerin ê Xwedê çawa bike.»

Lê di gotin û cidîyeta «berxê» xwe derdixist ku ew ê biterqiya. Û ne cihekî nêzîk jî; ê sînor jî derbas bikirana. Xerîbî zehmet bû, derdê xurbetê giran bû. Ji xwe li ser talûkên bi rê

de ne dixwest ku bifikire. Bi rê de cendirme, mayîn hebûn û viya jî xof dixiste dilê wê, ew ditirsand.

Bavê rahişti bû çifte û rextê xwe û derketi bû, li dor xênî digeriya, harisî dikir. Beriya ku derkeve jî; «Lawê min tu ji xwe re rakeve, ez bavê te me, ez nahêlim çivîkek jî nêzî mala me bibe. Berê sibehê jî ez ê te ji xewê rakim» goti bû.

Herdu li hundur bêhnekê wisa bêdeng man. Tenê vizîniya bayekî xurt dihat û di terkên ber pacê û qelşên di dîwêr re êrîşî hundur dikir. Dema wisa bi heyranî û evînî li lawê xwe temaşe dikir, bêhemd gilorîkên wê hati bûn xwarê. Lawê wê; «Dayê megrî, tiştek tune, tişt nabe, ez ê vegerim!» got.

«Li diya xwe negire, lawo. Dilê hemû diyan bi ser lawan ve ye. Kî dizane bê bi çi keşkûliyê heta meriv lawekî mezin dike, bi firê dixe û paşê jî...» got. Di vir de xwest ku rewşê jê re kat bike, lê wê; «Na, lawo ez dizanim, fam dikim. Min bi çavên xwe ewana dîtin. Agir ji devên wan dibariya, fena kûçikên har bûn. Na lawo xwe neke destê wan, bêbav in!» got.

Di vê navbênê de bav jî keti bû hundur; «Vê sermayê, çivîk jî li der nikanin rawestin!» got û hat dîsa li ber pacê cihê xwe girt.

Hinekî şûnde diya wî çû bû odeya mêvanan, cihê «berxê»» xwe edilandi bû; «Berxê min, nivînên te min danîne, rabe ji xwe re hinekî rakeve.» got.

Piştî ku «berxê» wê çû oda din û raket, herdu bi tenê ma bûn. Bav li ber pacê bû û awirên xwe ji ser riya tirmpêlan ku dizîvirî gund qut ne dikir. Ew jî li quncikekî odê rûnişti bû û lihêfek heta nêvî kişandi bû ser lingên xwe. Li hundur bêdengiyeke mirî hakim bû. Bi hev re ne dipeyivîn, lê di serê her-

duyan de jî eynî tişt derbas dibû.

Ew ê ji lawê xwe yê bi tenê cuda bibana. Lawê ku kî dizane bê bi çi keşkûlîyê mezin kiri bûn û dabûn xwendinê. Ji bo wan ji viya zehmetir tiştek nikanî bû bi serê wan de bihata. Ji hêvî û sitûna mala xwe dibûn. Diya wî xwe bi xwe tinaz dikir û digot; «Xwedê mala sebeban xira bike!...»

# TABÛT

Zivistana 1974an bû, gundiyên S. ji derveyî Mirad û malbata wî, yên din hemû ji mêj ve keti bûn nava nivînan û kî dizane bê ev xewna çendan bû ku didîtin. Ev şeva duduyan bû ku li mala Mirad, lemba wan wisa heta nîvê şevê diçurisî.

Mirad di hundurê oda xwe de li ber soba bêagir paldayî, kaxezek di dest de lê dinêrî û diponijî; serî gavê jî serê xwe li ba dikir û dikire niçeniç.

Ji nivis û mora li ser dihate famkirin ku kaxezeke fermî ye. Kaxez di nava tiliyên xwe de bi vir û wir de diqulipand... çep û rast digirt û bêwestan awirên xwe li nivisa ser digirt. Li ser kaxezê tiştê ku pê xerîp ne dihat û dikarî bû bixwenda, bi tenê navê wî bû; «Mirad Çiruk!»

Ji ber ku muxtarê gund kaxez dabûyê her cara ku Mirad li kaxezê dinêrî, muxtar dihate bîrê.

Berî du rojan ber bi nîvro du cendirme hati bûn gund, ev kaxeza dabûn muxtêr û bi şûn de vegeriya bûn. Muxtêr gazî Mirad kiri bû û kaxez dabûyê. Dema Mirad goti bû; «Ez tiştekî jê fam nakim!» muxtar berçavka xwe derxisti bû, dabû ber çavên xwe û jê re xwendi bû. Lê wexta ku Mirad dîsa goti bû; «Min qe tiştek fam ne kir!...» vêca muxtar hinekî bi hêrs careke din jê re xwendi bû û bêje bi bêje jî wergerandi bû. ««... Li dadgeha Komara Turkiyê ya tawangiran, li bajarê M. di tarîxa ... saet... li... de divê hûn amade bin!»»

Mirad ji tirsa ku dîsa muxtar hêrs neke tu pirsek din jê ne kiri bû, kaxez ji dest girti bû û rast riya mala mamostê gund girti bû.

Lê mamoste jî tiştê ku muxtêr jê re goti bûn ducar kir. Lê dîsa jî Mirad têra xwe pirs ji mamoste kiri bûn.

Tiştê ku lê behîtî bû, bê ji bo çi xwesti bûn qet tu sedem di kaxezê de ne dabûn xuyakirin. Vê yekê jî Mirad gelekî bêhaf dikir û tiştên nebûyî dihanîne bîrê!

Ev cara pêşîn bû ku kaxezeke wisa fermî ji dadgehê jê re hati bû. Mirad di jiyana xwe de qet têkilî tu tiştekî bêqanûnî ne bû bû, ji ber vê jî dadgeh hêj bi çavên xwe ne dîti bûn. Dema ku ji nişka ve kaxezek wisa ji dadgehê -him jî ya tawangiran- jê re hat, ew bi carekê qidûmşikestî kiri bû. Nema dizanî bû çi bikira. Ji fikirandina vê bûyerê ne dilê wî diçû xwarinê û ne jî xewa wî dihat. Ev ji serê du rojan de guhertinek ecêb pê re çêbû bû. Te digot qey ew xwîniyek e û ew ê anuha wî dardekin! Dawiya dawîn jî dest pê kiri bû pir behîtî

dipeyivî.

Di ber xwe de; «Ji bo çi? got. Min tu kes ne kuştiye, tu kes ne şelihandiye û dizîya tu kesî jî min ne kiri ye!»

Rabû ser xwe, dîsa rûnişt; fitilî ser pîreka xwe Hezarê ku tevî herdu zarokên xwe di quncikekî odê de bêdeng rûniştine. Te digot qey ew jî ji gava ku mêrê wê ev kaxeza girtiye, şînê dikişîne! Mirad mîna ku bixwaze, li ber şewqa lembeya ku bi zor hundurê odê ronî dikir, wan bitefsilîne, serê xwe ber bi wan bir û qêriya; «Min çi kiriye? Sûcê min çi ye? Hela bibêje bê çi sûcê min heye!»

Qidûmê jinikê û herdu zarokan şikest, zarokan hişk bi dawa diya xwe girtin. Hezarê hinekî bi tirs lê vegerand; «Tu sûcê te tune, bavo!... ma çi sûcê te ê hebe!»

Mirad serê xwe hejand; «Hii... got. Tu sûcê min tune, na xwe! Ma çi sûcê min ê hebe!»

Lê ev gotinên dawîn bi şêleke mîna ku bixwaze bibê; «Ez dizanim bê sûcê min çi ye!» goti bûn.

Bi rastî jî hingî ku fikirî bû êdî serê wî tevlihev bû bû. Wisa bû bû ku êdî wî jî ji xwe şik dikir. Pêre hîsek weke ku li hemberî dewletê hin xerabî kirine, çêbû bû. Lê bê çi kiri bû qet ne dihate bîrê! Tenê tiştek bi bîr dihanî, ew jî ev bû ku carina di derheqê cendirme û tehsîldaran de nebaş fikirî bû. Wan deman xwestinek mîna ku bi dest biketa û jê bihata, wî ê kela dilê xwe li van cendirme û tehsîldaran hênik bikira, heta çend kes ji wan bikuştana jî... Lê ev xwestina xwe ne pêk anî bû û ne jî ji keskî re goti bû. Tenê xwestinek jî nikanî bû biba sedemê tu sûcan!

Mirad dîsa çavên xwe li hundurê oda nîvtarî gerand, li pî-

reka xwe û herdu zarokan nerî; deng û hîs ji wan dernedikel. Hingî ku xwe bi dîwêr ve şidandi bûn, te digot qey bûne perçeyekî ji dîwêr. Bi hînetiyeke kevn, destê xwe xiste bêrîka yelegê xwe da li saetê binêre, lê dema hate bîrê ku saeta xwe beriya sê mehan winda kiriye, zû paşde kişand.

Di ber xwe de bi dengekî nîvxeniqî; «Di kû de zirav be bila di wir de biqete!» got. «Yekî ku sûcê wî tune be çima ê bitirse! Rabe, nivînan deyne!»

Weke ku tu sîtilek ava sar li dilê jinikê bikî, wisa bîhna wê vebû, ew tirs ji ser firiya çû û bi lez rabû ser xwe, dest bi raxistina nivînan kir.

Bi dû vê navtêdana xwe bi xwe re, te digot qey tirsa li ser Mirad jî kêm bû bû, hinekî qidûm pê ve hati bû.

Lê sed mixabin ku ev mêrxasiya wî tenê ji bo bêhnekê bû. Dema ku kete nav nivînan, lihêf kişand ser serê xwe, ramanên li dora vê bûyerê fena mêşan ku xwe çawa li şêrînayê bigrin, wisa êrîşî serê wî kirin.

Xwest ku di serê xwe de planekî çêbike, ew ê çawa bersiva pirsên dadpirs bide. Lê ji ber ku nizanî bû ew ê çi pirs jê bêne kirin dev jê berda. Fikir kir ku pêşiyê biçe bi advokatekî bişêwire; lê vê jî mesrefeke zêde dixwest ku aboriya wî têrê ne dikir...

Hêj wisa difikirî, ji nişka ve germiya laşekî nerm bi laşê xwe ve hîs kir. Ev germî hin bi hin li laşê wî tevî belav bû, pir jî li xweşa wî diçû. Vê germiyê, rehên laşên wî yên ku ji qehr û tirsê şidiya bûn hemî sist kirin. Wisa bi kêr bû ku serê wî bi carekê re ji ramanan vala kir... xwe bi vê germiyê ve qenc şidand û di xew re çû.

Heta berbanga sibê, bi xêra germa wî laşê nermik bêxem raket. Lê dema ew germiya ku di laşê xwe de hîs dikir kêm bû, nema lê kêr kir; ramanên bi xof dîsa dest pê kirin di serê wî de vêketin.

Di xewnê de:

«Xwe li hundurê odeyeke mezin didît. Li hawîrdora xwe dinerî, hertişt pê ecêb dihat. Li hemberî wî, li dora maseyekê du sê kesên bi cube rûniştî bûn. Li her aliyekî wî jî cendirmeyek rawestî bû. Fikirî ku ev der ê dadgeh be û evana jî ê dadpirs bin. Dadpirsekî awireke dijwar tê vedida, dûre jî bi destê xwe tiştek ji ser masê bilind dikir. Mîna ku saeteke bêrîkan bû. Saet nêzî wî dikir, jê dipirsî, «Ev saet ya te ye?» Wî li saetê dimeyizand, fam dikir ku saeta wî ye. Bersiv dida; «Erê ezbenî, ya min e!» Bi dû de jî dixwest ku bibê; «Beriya sê mehan min winda kiri bû!» Lê dadpirs mefer ne didayê, gotina wî dibirî û serê xwe dihejand; «Baş e, baş..., digot. Tu dizanî bê ev saet li kû hatiye dîtin?» Dadpirs li benda bersiva wî ne dima û axaftina xwe didomand; «Ev saeta li ser cendekê du cendirman ku li ser riya gundê we hati bûn kuştin, hatiye dîtin! Evaya delîlekî gelekî xurt e ku tu berpirsiyarê vê kirinê ye!» Piştî ku gotina xwe diqedand, dadpirs destê xwe ber bi cendirman dikir û digot; «Wî bibin!»

Gava ku cendirman dikirin wî bibin, Mirad li ber xwe dida. Lê herdu cendirman hişk bi çeplên wî digirtin û ew bi dû xwe de dikişkişandin.

Bi dû xwe de, di deriyekî re ew dixistin hundurê hewşeke fereh. Dema Mirad didît ku di hewşê de kindirekî dohnkirî bi dara sêpîyê ve li ba dibe, heta ku jê dihat diqêriya, xwe davêt

erdê... Lê cendirman ew ji erdê bilind dikir, li ser destên xwe ew dibirin binê dara sêpîyê. Destên wî li paş girêdidan, ew derdixistin ser sandaliyekê; yekî ew digirt û yê din jî kindir dikire situwê wî. Bi dû de jî sandalî ji bin lingan dikişandin. Pê bi pê bîhna wî diçikiya, wexta dikir ku bifetise, ji nişka ve ji xew vedieiniqî!»

Dema ku ji xew çemd bû, dît ku pîreka wî ya di xew de, çeplê xwe li situwê wî gerandiye. Wisa şidandi bû ku Mirad bi zor bîhna xwe digirt û dida. Bi lez situwê xwe ji çeplê wê xelas kir, rabû ser xwe. Ji tirsan laşê wî tev dilerizî. Lê dema bi ser hişê xwe ve hat û fam kir ku eva tenê kabûsek bû gelekî kêfa wî hat!

***

Sibê:

Mirad ji bo ku ê biçûya dadgehê gelekî bi heyecan bû. Nema dizanî bû ê ji kuderê dest pê bike! Geh diçû axur li heywanan dinêrî, geh dihat hundurê odê li zarokan dinêrî û hinekî jî bi sobê ve dilebikî. Di dawiya dawîn fam kir ku divê haziriya xwe bike. Ew ê hêj du saetan bi rê va biçûya heta ku bigihişta ser asfaltê û ji wir jî ê bi tirumpêlekê riya xwe bidomanda.

Mirad çavê xwe li pîreka xwe gerand, dema ew di hundur de ne dît, bi dû de qêriya; «Hezarê! Hezarê!...» Hinekî şûnde deriyê odê vebû, pîreka wî derbas bû hundur. Ji nanên di dest de xuya dikir ku çûye ji cîranan nan deyn kiriye.

Rebenê ji pêr de, ji xeman ne nan û ne jî xwarin çêkiri bû. Lê vê sibê ji bo ku mêrê xwe birçî bi rê neke; şorbeyeke nîskan dabû ser êgir. Dema dîti bû nan qedîyaye, ji neçarî çû ji

cîranan deyn kir.

Ji aliyekî him berfa li ser xwe dadiweşand û him jî ji Mirêd re; «Li der berf û bahoz e! Çûk bi çûkaniya xwe, gur bi gurîniya xwe, ji sermayê li der nikane bisekine. Tu ê çawa biçî?»

Mirad serê xwe rakir, awirek tê veda û tenê got; «Kincên min hazir bike!»

Hezarê awirê mêrê xwe yê cidî fam kir ku minaqeşe bêfêde ye. Paşê rast çû sindoqa xwe ya bûkaniyê vekir, kincên Mirêd yên herî paqij jê derxistin û anîn li ber danîn.

Bi dû ku Mirad taştiya xwe xwar, bi lez rabû ruwê xwe kur kir û paşê jî dest pê kir kincên xwe li xwe kirin.

Wexta ku Mirad îşlegê xwe yê sipî î ji hîzar, ku pîreka wî jê re dirûti bû, li xwe kir fena kefenekî li ser qama wî ya kin rûniştî. Derpiyê wî yê sipî ku heta bi ser kabokên wî dadiket, te digot qey alîkariya işleg dikir û kefen timam dikir. Lê gava ku panteron bi ser de li xwe kir têmtilê wî hinekî edilî. Ji xwe kincên wî jî her evana bûn. Eger xwest ku kevneqezaxê xwe ku te tayek jê bikişanda ê tev verşiya - li xwe ke jî, dît ku têmtilê wî ê bi carekê xera bibe, dev jê berda. Bi dû ku qapûtê xwe li xwe kir, şewqa xwe di serê xwe de ediland, destmalek jî di ser şewqê re li binguhê xwe pêça. Paşê qewlikê xwe yê peran kontrol kir û xiste bêrîka xwe.

Di wê navbênê de çavên wî li herdu zarokên wî ket, pêre pêre dilê wî şewutî, heznekê pê girt, kelogirî bû û çû herdu zarokên xwe hemêz kirin. Dema keça xwe ya biçûk, Zerî hemêz kir, bêhemd gilorîkên wî hatin xwarê. Bi lez pêlavên xwe kire lingên xwe û di derî re derket.

Riya esfaltê ji gund teqnekî dûr bû. Li gund tu tirumpêl

tune bûn; ji bo ku meriv biçûya bajêr diva bû ku meriv ji gund derketa ser riya asfaltê û ji wir tirumpêlek bigirta. Wexta ku dunya xweş bû ev riya bi peyatî saetek dajot lê dema ku zivistan bû ev riya nêzî du saetan dikişand.

Digel berf û bahoza ku dihat dîsa jî Mirad xwe zû gihandi bû ser riya asfaltê. Lê şensê wî! Tirumpêlê ku dihatin lê ne disekinîn.

Li ser asfaltê nêzî saetekê li hêviya tirumpêlan ma. Destê xwe ji hemî tirumpêlên ku derbas dibûn re bi mana ku rawestin bilind dikir... digel bi tiliya xwe nîşan dida ku rêwiyekî bi tenê ye jî dîsa tu tirumpêl ne disekinîn. Ji xwe li ser rê ji wî pêve tu kes tune bû.

Dûre hêviya xwe qut kir, ji nuha ve dest pê kiri bû ji sermayê di cihê xwe de dicirifî. Li şûna xwe li qeremîska rûnişt, serê xwe xiste nava qapûtê xwe û xwest bi hilma xwe destên xwe yên nîvqefilî bigermîne.

Xwe bi xwe fikirî ku paş de vegere malê, lê vê saetê ev fikir ji serê xwe avêt. Xwe bi xwe; «Mehkûmî!» got. «Na!... evaya ne karê min e. Mala min, zarokên min... na li darê dunyayê tiştekî wisa nabe. Ez ê herim ji hakim efendî re bibêm: Ezbenî va ye ez hatim! Çi gunehê min hebe ez jê re amade me; eva serê min û ewa şûrê we! Hûn çi ferman bikin!... ma wê çi ferman bike, ew ê ji min re bibê; "Rabe lawê min yê şîrhelal, min tu efû kir" û ez ê bi şûn de vegerim malê!»

Hêj wisa di van ramanan de bû, dît ku yek lê diqîre. Bêyî ku haya wî jê çêbûbe otobozek ji evên piçûk hati bû li ber sekinî bû.

Mirad rabû ser xwe, ber bi otopoza piçûk çû. Şofêr; «Tu ê

bi kû de biçî?» Mirad; «Ez ê biçim bajêr» got. Şofêr; «Siwar be!» got. Mirad di pacan re çavek li hundur gerandi bû, dît ku rê û rêwanî di hundur de tuneye. Dema ku dîsa li şofêr meyizand, şofêr serê xwe bi jor de kir; «Li jorê siwar be» got. Miradê ku ji serma diciriſî qet tiştekî wisa ne dipa. Lê şofêr ew xiste ber fediyan, li rêwiyên din nerî bû û berê xwe pê ve kiri bû; «Tu mîna nehîtekî ye, ma wê çi bi te bê! Aha saeteke, em ê vêga bigihêjin bajêr... pênc lîran bide bes e!» got. Êdî ji fediyan ba jî Mirad ê siwar biba, qewlikê xwe derxist pênc lîre hejmartin dane şofêr û çû paşiya otopozê bi derenceкên wê ve hilkişiya.

Wexta ku hilkişîya jor û çavên wî li tabûta ser ket, xwest bi paş de vegere. Lê şofêr gaz dabûyê û Mirad ji bo ku nekeve xwe hişk bi hesinên kêlekê ve girt.

Mirad di rewşeke xirab de bû, ji sermayê êdî hertişt ji bîr kiri bû. Tenê hêvî dikir ku nuha li ber sobeyeke germ paldayî ba. Ji bo ku nekeve diva bû xwe bigirta û viya jî rê ne didayê ku bi hindikayî jî ba, xwe ji sermayê biparazta.

Hinekî wisa di vê rewşê de, ji nişka ve tabûta li tenîştê ku lê dimeyizand, fikrek şeytanî di serê wî de pêxist! Xwest ku vê fikrê zû ji serê xwe bavêje, lê sermayê rê ne da... Xwe hinekî nêzî tabûtê kir. Bi destekî xwe girt û bi destê din jî li werîsê ku pê tabût şidandi bûn, xebitî. Werîs di ser tabûtê re avêti bûn û bi hesinên kêlekê ve girêda bûn. Mirad dît ku werîs sist e, bi dû ku ew jî hinekî pê lebikî, ew baş sist kir û bi aliyê lingan ve dehľand. Êdî dikarî bû qepaxa tabûtê vekira, ji ber ku qepax jî li çepê bayî bû, viya jî karê wî hêsantir dikir.

Lê ka ew dilê ku biwêre qepaxê vebike! Eger ku yekî mirî

tê de ba! Vê yekê wextî Mirad ji fikra wî vegeranda. Lê bi qasî serma ku dixwar ewçendî jî meraq li ba wî çêbû ku binêre bê çi di hundurê tabûtê de heye. Bi dû ku hinekî wisa dudilî ma, di dawiya dawîn de biryar da ku qepaxê hilde.

Dest pê kir qepaxa tabûtê hêdî hêdî rakir, lê ji bo ku zû jî bigire xwe hazir kiri bû. Eger ku çavên wî li paçekî sipî, li destekî an li tiştekî din biketa, wî ê qepax di dest de bigirta.

Lê wexta ku qepax baş bilind kir û çavê wî li tiştekî ne ket, bêhna wî vebû, kêfa wî hat. Serê xwe xiste hundurê tabûtê û li aliyê lingan jî baş nerî, gava qene fam kir ku vala ye hêdîka çîpeke xwe tê de dirêj kir û wisa yê din jî...

Tabût mezin bû, bi rehetî xwe tê de dirêj kir û fikirî ku ew ê yekî din jî bi rehetî xwe bikari be li teniştê dirêj bike! Dema ku qepaxa wê girt hundurê tabûtê bi carekê tarî bû, lê, xem ne dikir, ji wê zemherîra der xweştir bû!

Bi dû ku teqnekî bi rê ve çû bûn, rastî gundekî, otoboz li ber du rêwiyên din jî sekinî bû. Yê şofêr ew herdu jî li jor siwar kiri bûn û ji wan re goti bû; «Li jor yekî din jî heye!»

Dema herdu rêwî li jor bi cî bûn û li wir ji tabûtê pê ve tiştekî din ne dîti bûn, gotina yê şofêr bi mana; «Yekî mirî li jor e!» bi mane kirin û di ruwên wan de xuya dikir ku kêfa wan ji vê heneka şofêr re ne hati bûn. Miradê ku di taya sermayê de bû, deng ji xwe dernexisti bû û tiştek li xwe çênekiri bû. Lê dema ku wisa jî mane kiri bûn, gotinên ku di camiyê de ji melê, di derheqê dunya din de bihîsti bûn, hemû bi bîr anîn! Hemû çîrok û meselên di derheqê miriyan de di hişê wan re wê gavê derbas dibûn. Hemû milayîketên ku navê wan dizanîbûn bi bîr anîn! Viya jî tirs û xofa mirinê xisti bû dilê wan!

Di wê navbênê de jî rewşa Mirad pir xerab bû bû. Sermayê ew di hundurê tabûtê de jî rehet ne hişti bû. Bayê ku di qulikên tabûtê re dikete hundur li kezeba wî kêr dikir. Dûre biryar da ku ji tabûtê derkeve. Difikirî ku otobozê rawestîne û biçe ji wan tike bike bê cihekî jê re di hundur de çênakin.

Dema ku ji nişka ve qepaxa tabûtê lebitî, gwîn li herdu rêwiyan vemirî! Ziq li hev nerîn û li tabûtê nerîn! Şik jê re tune bû, mirî bi ruh dibû!

Qapûtê Mirêd jî di kelemekî de awiqî bû û nikanî bû jê xelas bike. Heta ku di hundurê tabûtê de milên xwe ji qapût kiri bû, şewqe û destmala wî jî ji serî keti bûn. Dema ku heta newqê xwe ji tabûtê derxist, destên xwe dirêjî herdu rêwiyan kir da alîkariya wî bikin...

Miradê bi ruwê xwe yê ku ji sermayê reşûşîn bû bû û bi îşlegê xwe yê mîna kefenekî, ji saxan zêdetir mirîyek dihanî bîra meriv! Dema destê xwe jî ber bi wan kir, rêwiyekî xwe ne girt û xwe ji otobozê werkiri bû!

Ew ê rêwiyên di hundur de diti bin loma jî li şofêr qêriyabûn û otoboz zû rawestandi bûn.

Hemî rêwî ji otobozê peya bû bûn ku binêrin bê çi qewumîye! Dîmena li ber çavên wan hemû di cî de matmayî hişti bûn!

Mirad bi zor xwe ji tabûtê xelas kiri bû, lê lingên wî hêj di tabûtê de bûn û şipya bû. Wexta dît ku rêwî tev lê ecêbmayî dinerin û rêwiyên pîrek; «Pepûk! Pepûk!» dibên, destê xwe bilind kir û got; «Ez!...» Xwesti bû ku bibê;«Ez ji saxa me, ne mirî me!» Lê zimanê wî negeriya û ji ser otobozê kete xwarê.

Ji sermayê qefilî bû.

# BAFILE

Eva demek bû ku pîrika malê bêhal bû. Dilê wê yê ku heftê salan bêwestan lêxisti bû dida xuyakirin ku êdî westiyaye û vê vatiniyê nema dikane bimeşîne. Pîrikê ji xelkê malê xwest ku cihê wê li ber pacê çêbikin. Mîna wan jî dizanî bû ku pîrika ixtiyar rojên xwe yên dawîn dijî, ji ber vê jî hemû xwestinên wê bi cî dihanîn û cihê wê vê gavê li ber pacê, li oda jorîn çêkirin.

Dîsa li ser xwestina wê, oda jorîn ji qerebalixa zarokan û çûnûhatina mêvanan mehrûm hişti bûn. Di oda dengmirî de, pîrika ixtiyar tena serê xwe li gel raman û bîreweriyên jiyana xwe ya derbasî bû.

Ruhstênê ku leza wî hebû, li dorhêla malê diçû û dihat.

Her ku derî vedibû çavek li hundur digerand, dinerî ka pîrika ixtiyar amade ye ku ruhê xwe teslîm bike an....

Lê dema didît ku pîrika ixtiyar bi bîreweriyên jiyana buhurî ve meşgûl e, fersendek didayê, ne dixwest wê nerihet bike û dîsa bi paş de vedigeriya.

Dibên dema ku mirov diçe ser heqiya xwe, beriya ku ruhê xwe teslîm bike, hemû jiyana xwe bi bîr tîne. Jiyana meriv mîna şerîteke filîmê sînemayê di ber çavên meriv re derbas dibe.

Lê eva ji bo pîrika ixtiyar ewçend ne hêsan bû. Wê ê li filîmê kîjan jiyanê bimeyizanda! Jiyana wê ya eslî jê dizî bûn. Heta dehsaliya xwe ew jiya bû. Ew deh sal li ocaxê bavê, li gel xweng û biran, ehl û dostan, bi germiya evînê û dostaniyê bihurandi bû. Hê jî dema ku difikirî, germiya evîniya wê jiyanê li canê xwe hîs dikir. Dengê dê û bavê di guhên wê de olan dida: «Marya... keça min, xwe zû girêde, em ê biçine dêrê! Em dereng nemînin... nuha ayînê dest pê kiriye!» Wê gavê ê Marya kineên xwe ên xweşik li xwe bikirana û li gel dê û bav, xweng û birayên xwe, riya dêrê bigirtana. Dengê jama dêrê ji dûr ve dibihîstin, ev îşareta destpêkirina ayînê bû. Lê xem ne dikir, dereng jî bimana ew ê dîsa biçûyana, li nav dost û merivên xwe, cihê xwe bigirtana, paşê jî guhdariya metrên bikirana.

Wê demê Marya zêde tiştek ji gotinên metran fam ne dikir, lê dîsa jî beşdarbûna ayînê li xweşa wê diçû. Li wir hemû hevalên xwe didîtin. Dêr jî avahiyeke mezin û bilind bû. Hemû bi heykel û wêneyên pîrozwer xemilî bû. Li beramberî xelkê, li ser dikek hinekî bilind û ferch, xaçek kevirîn û mezin

bilind dibû û bi xaçê ve jî heykelê Mesîhê xaçkirî, dardekirî bû. Ji herdu dest û lingên wî yên ku bizmar tê de kuta bûn, xwîn diherikî, herweha ji kêlekek wî jî xwîn diherikî. Marya çîroka Mesîh dizanî bû, ji ber ku li malê jî dê û bavê wê eva kat dikirin: Mesîh lawê Xwedê bû; mîna mirovekî hati bû dunyayê. Wî xwesti bû, gotin û heqiya Xwedê pêşkêşî mirovan bike û bi vî babetî mirovan ji zilm û zordariyê azad bike. Lê mirovan jê bawer ne kiri bûn, helbet ne hemûyan. Yên ku jê bawer kiri bûn jî hebûn; donzdeh hewarî û wekîdin jî hin mirovina baweriya xwe pê anî bûn. Lê yên mîna Heredos û Pontus Platus pê bawerî ne anî bûn, evana jî mirovên bi qewet, paşe û general bûn. Li ser daxwaziya wan jî Mesîh ku lawê Xwedê bû, mehkeme bû bû û hati bû mehkûmkirin. Paşê jî ew li xaçê xisti bûn. Hercar bavê wê; «Erê!» digot. «Ew bû qurbanê gunehkariya mirovan, wî xwe kire qurban, ji bo ku Xwedê me efû bike!» Bavê wê jê re; «Marya!» digot «Me navê diya Mesîh li te kiriye. Navekî pîrozwer e.» Lê nuha, mîna gelek tiştên din ev nav jî bû bû xewneke şevan. Ev şêst sal bûn ku ev nav bi kar ne anî bû. Neviyên wê, pîrika Emînê jê re digotin û wisa gazî dikirinê. Emîne jî navekî pîrozwer bû, lê eva ne ji bo mesîhiyan, ji bo misilmanan wisa bû.

Gerçî navê Emîne ew ji mirinê xelas kiri bû, lê nuha dema ku difikirî, têdigihişt ku bi vî navî re gelek tişt jî winda kiri bûn.

Dibên "Zeman hemî birînan derman dike!" Lê eva ji bo pîrika Emînê derbas ne dibû. Di dawiya temenê xwe de, ji nû ve bû bû zarokek. Ew Marya ku şêst sal berê di hiş û dilê xwe de veşarti bû, serê xwe derdixist û dibişirî. Marya evîndar ku

mîna çîçekek nûbişkuvî bû, girti bûn û hilqetandi bûn; ji dar û erda wê kiri bûn. Lê nuha ji nû ve dixwest bibişkuve, ji nû ve dixwest bibe Marya. Û vêca ew ê tu kesî rê li ber ne girta, ne axayên kurd yên zalim û ne jî leşgerên osmanîyan!

Bi bîreweriyên Maryayê re birînên şêst sal berê jî ji nû ve vedibûn. Eva birînên dijwar bûn û di wextekc mîna şêst salan de derman ne dibûn, ji bîr ne dibûn. Hê jî dema ku ew rojên fermana mezin bi bîr dihanîn, dicirifî, ecêbmayî bû û hiş û aqil ne dida mekruhî û barbariya mirovan! Mirovên ku cîranê wan bûn, ewên ku di bajarekî de, li kolanekê bi salan li gel hev jiya bûn û ji hev re digotin; «Krîvo!» û «Krîvê!»; di rojên fermanê de gelek ji wan bû bûn mîna gurên devbixwîn û êrîş dibirin ser wan, ew dikuştin û talan dikirin. Belê ev ne karê mirovan bû, ev ne karê aqilan bû...

Lê birîna giran, êşa ji hemûyan mezintir, windakirina dê û bav, xweng û birayan bû.

Di wexta fermana mezin de bû: Rojekê dîsa famîlya wan hemû li gel dost û merivên xwe, li dêrê civiya bûn. Metran wazên xwe kiri bûn. Di nav wazên metrên de tenê gotinek dihate bîra wê. Eva ji Incîlê bû, Mesîh goti bû; «Ji dijminên xwe hez bike!» Paşê jî koma zarokan dest bi kilamên dînî kiri bû, distiran. Marya jî gelek caran beşdarî vê komê dibû. Lê nuha tu kilam bi bîr ne dihanîn, ji xwe ji wê rojê û vir de qet tu kilam ne goti bûn.

Hê koma zarokan kilama xwe didomand, dema dengê şawşawekê nêzîkayî li dêrê dikir, zarokan dev ji kilamê berda bûn, hemû mirovên di hundurê dêrê de, mîna ku dîzanî bûn ew ê çi biqewume, komî ser hev dibûn. Çend ixtiyaran li hem-

berî heykelê Mesîh îşareta xaçê derdixistin û due dikirin. Metran ji cihê xwe radibû, ber bi deriyê dêrê diçû û ji yên hundur tika dikir ku bêdeng bin. Lê ji nişka ve deriyê dêrê bi şingeding vedibû û komek leşker û zilamên kumsor, bi çek û rextan pêçayî, êrîşî hundur dikirin.

Metranê ku li ber derî, li ser kabokan ji wan tika dikir, derba pêşin xwari bû! Paşê jî dest bi yên din kiri bûn; bi sunguyan û guleyan!... Mîna gurên birçî bûn, kerîyekî pez bêxwedî û bêşivan dîti bûn! Dawî ne dihat, ne diqediya, ta ku deng ji hemûyan bilîya bû. Diya Maryayê ew hemêz kiri bû, xwe avêti bû ser, ew ji sunguyan parazti bû. Marya, bêdeng û behîtî bû. Xwesti bû biqîre lê nikanî bû. Dîmena li ber çavan ew lal kiri bû, matmayî bû!

Di nav cendekên mirovan re li jor, li xaça bilind ya kevirîn meyizand. Ji dest, ling û kêleka Mesîh xwîn diherikî; lawê Xwedê ji nû ve li xaçê xisti bûn!

Piştî demekê kalemêrek hati bû hundurê dêrê û bi xemgînî wehşeta hundur keşif dikir. Hinekî şûnde jî Marya qidûmşikestî û matmayî li paş xaça kevirîn didît. Bi dilovanî destê xwe dirêjî wê dikir. Marya bi şik û dudilî destê xwe didayê. Kalemêr jê pirsî bû;«Navê te çi ye?» Wê bi cirifîn; «Maa... Marya!» goti bû. Kalemêr hinekî fikirî bû û; «Baş e, Marya, guh bide min!» goti bû. «Ji nuha û pê ve, navê te Emîne ye! Viya ji bîr meke, kî ji te bipirse tu ê wisa bersivê bide!» Paşê jî ew biri bû mala xwe. Li mala kalemêr, ji pîrejina wî pê ve keseke din tune bû.

Ji wê rojê û vir de, Marya bû bû keça kal û pîra misilman û navê wê Emîne bû.

Emînê weke keçek misilman, ders û edeba misilmaniyê girti bû û di hivdehsaliya xwe de jî gihişti bû mêrekî misilman, pê re zewucî bû. Ji vê zewacê jî Xwedê sê law û du keç dabûnê. Emînê jiyaneke bê bela û bê nexweşî bihurandi bû û gihişti bû temenekî giramgîr, mîna heftê salî. Lê çendî ku ji kesekî re behs ne kiri bû û xwesti bû ji bîr jî bike, dîsa bîreweriyên jiyana Maryayê ew berneda bûn. Nuha di rojên xwe ên dawîn de jî ji nû ve bû bû Marya!

Lawê wê, yê mezin mîna ku ne dixwest diya xwe ya ixtiyar, di saetên dawîn de tenê bihêle, loma jî her serî gavekê dihat, li ber serê wê rûdinişt û pê re mijûl dibû. Carekê jî dema jê pirsî bû ku tu xwestinên wê hene, wê gavê diya wî çavên xwe ên giranbûyî heta nêvî vekiri bûn û bi şik li lawê xwe meyizî bû. Lê dîsa jî bi hêviyekê, ji lawê xwe tika kiri bû û goti bû; «Min bigire bibe dêrê! Ez dixwazim li dêrê metranekî bibînim!» Wê gavê lawê wê bostekê ji erdê bilind bû bû! Û nemimkuniya vê daxwaziyê xwesti bû ji diya xwe re kat bike.

Paşê jî ji xelkê malê re goti bû ku; «Diya me xurufîye!...» Bi dû de jî, xelkê malê biryar dabûn da biçin melayekî bînin ku li ser çend fatîhe û yasînan bixwîne!

Lê Maryayê fam kiri bû ku tiştekî nemimkun ji lawê xwe xwesti bû û herweha ne dixwest ku guhdarî li tu fatîhe û yasînan bike. Ji ber vê jî ruhstênê ku li ber derî ecele dikir, vexwandi bû hundur û ruhê xwe teslîm kiri bû.

Dema mele gihişti bû ser, êdî dilê Maryayê rawesti bû, nema lêdixist. Mela êdî hewce ne dît ku tu yasînan li ser bixwîne, tenê fatîheyek xwendi bû û bi paş de vegeriya bû.

Dema mela çû bû, lawê wê xwesti bû laşê diya xwe rast bi-

ke. Gava destê wê yê girtî ji ser sînga wê bilind kiri bû, bi ecêbmayî, çavên wî bi xaçeke piçûk û zêrîn keti bû ku dibiriqî, rahişti bû xaçê, nêzîkî çavên xwe kiri bû, bi behîtmayî nivisa li ser xwendi bû; «MARYA»

# TIRŞIKÇÎ

Ber bi êvarekê li bajarê N'ê li quncikekî kêmmirov ya kaféyekê, du camêrên ji hazira ne zêde rûniştî bûn. Him çaya li ber xwe vedixwarin û him jî daxêvîn. Ji xwe di vê wextê de, li kaféyên bajêr zêde mirov peyda ne dibûn. Eger karekî girîng î van camêran tune ba, ewan jî mîna hemû camêrên din yên xwedî familye ê serê vê êvarê li nav zarokên xwe bûna û ji şîva ku xatûnên wan çêkiriye tam bikirana.

Ji herdu camêran, yê kin î dagirtî, rûçikqelew û çavbeloq, germa germa daxêvî. Wexta ku deng jî dikir mîna siyasetgeran hemû laşê xwe dilivand. Ji vê livandina laşê wî meriv têderdixist ku dixwaze yê hemberî xwe qanih bike.

Jê re digot:

- Lawo Mehmûdo, min bavê te baş nas dikir, rehma Xwedê lê be; mirovekî baqil bû. Lê tu qet li diruvê wî ne çûyî! Nizam tu çima wisa bêaqil î? Ma malê dewletê bi serê te ketiye! Her û wer tu harisek î!

Mehmûd bi temenê xwe hinekî ji yê hemberî xwe ciwantir, zilamekî porsor, dirêj û bejinzirav bû. Lê bi awirekê meriv têderdixist ku ev bejinziraviya wî ne xwezayî ye, herweha çavên wî yên ku di kortên xwe de dikirin winda bibin, şahidiya bêvîtamîniya di laşê wî de dikirin.

Serê xwe rakir, bêyî ku tiştekî bibêje li yê hemberî xwe nerî. Lê bi tewra xwe da xuyakirin ku ev gotinana di wext û cihekî cuda de dikanî bû bibana sedemê şerekî mezin di nawbêna herduyan de. Lê nuha xem ne dikir; ev gotinana ji heqaretekê zêdetir, wekû şîretekê qebûl kirin û paşê jî gulpek ji çaya ber xwe vexwar. Mada wî ya vala, bergirtiya vê çayê kir, lê bi qurequr mîna ku bibê; «Ez ne çayê, xwarinê dixwazim!» nedilxweşiya xwe raber da.

Yê din li cihê ku gotina xwe birî bû, dîsa dest bi axaftinê kir:

- Ca bibê! Ma ez ne rast dibêm? got.

Mehmûd:

- Belê, lê...

Yê din gotina wî birî û:

- Lê çi? got. Dewlet çi mehaniyê dide te, ez dizanim; sê hezar lîre! Lê, ma ev perena debara te dikin? Helbet na, wê têrî çi bikin û çi nekin?! Eva kirya xênî, mesrefa malê, ya zarokan û ya te!...

Yê ku nizanî ba ew ê bigota qey bi rastî jî evî çavbeloq ge-

lekî li ber zehmetiyên Mehmûd yên aborî dikeve û dixwaze alîkariya wî bike. Lê ne zû de bû, dema ku du sed lîre ji Mehmûd re pêwist bû bûn û çû bû cem ku jê deyn bike. Lewra wî bersiv dabû, goti bû ku nizam nuha çend hezar lîre deyn lê ne û her roj deyndaran dihatin deynê xwe dixwestin, lê çerxiyekî wî jî tune bû ku bida wan. Ji bo viya jî hemû milayîket û ewliya şahidê wî bûn ku wisa ye!

Rastiya li paş vê germî û nêzîkiya ku Girzo -belê, navê yê çavbeloq wisan bû- ji Mehmûd re raber dida, helbet bi babetekî din bû, sedemên wê hebûn.

Girzo li bajarê N. yê mitahidî dikir û di avakirina xaniyan de şîşên hesinî jê re gelekî pêwist bûn. Ne ji ber ku li bazarê şîşên hesin tune bûn û wî nikanî bû bikirîyana! Lewra mîna her mitahidî kêfa wî ji mesrefên zêde re ne dihat. Ji ber vê jî di avakirina xaniyan de, ji vê hêlê de gelekî xesîsî dikir. Ewqas ku çend xaniyên paş de dabûn xwediyan bi dû demekê de tebiqî bûn û xwediyên wan li dadgehê giliyê wî kiri bûn. Vê yekê jî destûra mitahidiya wî xisti bû talûkê. Wekî din jî perên ku ji vê xesîsiya xwe fêde kiri bûn, wekû bertîl dabûn dadistên.

Lê nuha Mehmûd jê re dermaleyek bi dohn bû û qet ne difikirî ku vê fersendê ji dest xwe birevîne. Eva jî ji ber wê yekê bû ku Mehmûd notirvaniya fabrîqeyekê dikir. Li vî quncikê welêt, her ku hilbijartina ji bo parlamentoyê nêzîk dibû, karbidestên dewletê dihatin bingehê fabrîqeyekê datanîn û soz didan xelkê ku ew ê mecalên kar û xebatê ji bo wan zêde bikin. Lê dema ku hilbijartin diqediya, kesekî nema tu salox ji wan digirt, ta hilbijartineke nû. Bi vî babetî jî bingehên fa-

brîqeyên ku datanîn, gelek caran tenê ji koncalek 2-3 meter pêk dihatin.

Lê qirdê Mehmûd hebû, ji bo bingehê vê fabrîqeyê, bi qasî 40 ton şîşên hesinî jî anî bûn li wê derê danî bûn û Mehmûd jî notirvaniya vî hesinî dikir. Girzo ku çavên xwe berda bû van şîşên hesin, dixwest bi perekî hindik Mehmûd qanih bike û biçe wan bar bike... Helbet ev perên hindik jî ji bo Mehmûd zêde bûn û gelek ji wan xewn û xeyalên wî yên ji bo dewlemendiyê pêk dihanîn.

Girzo di axaftina xwe de bi Mehmûd da famkirin ku Mehmûd çendî feqîr, perîşan û pêwistiya wî ji peran heye. Wekîdin jî li ser fêda peran ku li şexsê mirov dibe û çawa qîmet û giramiya şexs bilind dike, rawestiya.

Girzo:

- Li min binêre, ma ez kî me? got. Ez jî yekî nola te lawê gundiyekî xizan bûm. Berê kesekî qîmeta min ne digirt û gotina min li nav xelkê pênc pere ne dikir. Lê nuha ji ber ku çend qirûş perên min hene, dema ku ez diçim cihekî xelk bi giramî ji ber min radibin û cihê baştirîn di civatê de didine min û dema ku ez deng jî dikim civat bêdeng dibe û li gotinên min guhdarî dikin. Eva ji bo te fersendek e!

Mehmûdê ku li ber destê dê û bavekî dîndar mezin bû bû notirvanekî sondxwarî bû û ne dixwest têkilî malê heram bibe. Girzo ji vî xuyê Mehmûd jî haydar bû; ji ber vê jî rengê axaftina xwe guhert, anî ser mesela dîn û dewletê. Ji Mehmûd re şirove kir ku eva dewletek kafir e û tu têkiliya wê bi dînê îslamê ve tuneye. Ji ber ku nûnerên parlamentoyê teva ne nimêj û ne jî rojî digirtin. Wekîdin jî Girzo:

- Ev ne dewleta me ye, digot. Ma tu nabînî ku xortên me li hemberî wan dest bi şer kirine; her roj polîs û ajanên wan dikujin. Heqê wan jî heye. Beriya demekê çend xort hatin cem min, yekî ji wan digot; «Apo, hayê we ji dîroka me tuneye. Vê dewletê bi sedhezaran mirovên me kuştine û ew bê cî û bê war kirine! Lawên kurd yên qehreman mîna Şêx Seîd, Seyîd Riza bi dardekirine. Malê xelkê me, petrol û komira me her roj talan dikin!» Ma tu dibê qey gotinên vî xortî ne rast in? Belê ser dînê min be ev hemû rast in!

Mehmûd tenê guhdarî dikir; ji xwe wexta ku dixwest deng jî bike, Girzo rê ne didayê û gotina wî nîvçe dibirî.

Êdî derengî êvarê bû, nava Mehmûd î vala jî qurequra xwe zêde kiri bû; êdî dengên mîna hewaran derdixist. Herdu camêran fam kirin ku wexta çûyîna malê ye. Lê beriya ku ji hevdu biqetin, Girzo ji Mehmûd soz girt ku ew li ser vî tiştî baş bifikire, xew bike û di wexteke nêzîk de bersivekê -helbet yeke erênî- bidiyê.

Dema Mehmûd gihişt malê, pîreka wî, şîva wî ku ji girara rij û pîvazekê pêk dihat, danî ber. Mehmûd li girarê nerî û li pîreka xwe nerî, xwest ku tiştekî bibê lê pîreka wî rê ne dabûyê û;

- Ez çûm ba Salihê qesab! got. Lê ji min re got ku heta mêrê te deynê xwe nede ez giramek goşt jî bi deyn, nema didime we!

Mehmûd dengê xwe ne kir û dest bi xwarina xwe kir. Lê gotinên pîreka wî ne qediya bûn.

Pîreka wî:

- Îro xwediyê xênî jî hat, deynê xwe xwest, got. Heta mehe-

kê mihlet da me, an ew ê me ji xênî derbike. Ji bo van zarokan jî divê ez cawekî bikirim û berdilkan ji wan re bidrûm. Îro ji bo ku bê berdilk çû bûn dibistanê, mamostê wan ew bi paş de şandin malê!

Mehmûd dev ji xwarina xwe berda û li bêrîka xwe xebitî. Qewlikê xwe derxist, perê tê de tevî yên hesinî, hemû li ber pîreka xwe vala kirin.

- Aha, ji te re! Perên min ev in! got. Tu pê çi dikirî, bikere...

Pîreka wî pere ji erdê berhev kirin û hejmartin. Hemû 142, lîre û 50 qirûş bûn; fikirî ku ew ê têrî cawekî erzan bikin.

Bi dû van xeberên naxoş re, bija Mehmûd reviya bû, dilê wî nema diçû xwarinê, loma jî dev jê berda bû.

Gotinên Girzo careke din di serê wî re derbas bû bûn. Heqîqeta li paş van gotinan beyan bû, tu delîl ji feqîrî û perîşaniya Mehmûd re ne diva. Digel ku pêşniyara Girzo gelekî cazib bû jî, dîsa ne dixwest têkilî malê heram bibe.

Lê mîna ku dibên çavê timayê kor e, gelek lawên bavan yên şîrhelal bi vî babetî ji rê derketine û Mehmûd ne awarte bû. Di çend rojan de baweriya wî ya li ser helal û heramiyê sist bû bû. Êdî ji sedî sed baweriya xwe pê tanî ku eva dewletek kafir e! Dema rojekê jî înkognîto ji melakî pirsî bû, wê gavê melê jî fitwe dabûyê û goti bû:

- Xwarina malê kafiran helal e! Heta xêr e jî...

Wê çaxê Mehmûd biryara xwe dabû.

Dema şevekê bi derengî hati bû malê, êdî ji feqîriyê xatir xwesti bû! Pîreka wî heta derengî şevê bi dilekî taswas li hêviya mêrê xwe ma bû. Mehmûd derengî şevê dema di derî re

derbasî hundur bû bû, çenteyek di bin çengan de bû û devliken bû. Çente li ber pîreka xwe danî bû û jê re:

- Bi xatirê te, feqîrî, goti bû.

Pîreka wî pêşiyê tiştek fam ne kiri bû, gava Mehmûd jê re goti bû;

- Çente veke!

Wê jî vekir û matmayî jê pirsî;

- Te benqeyen şelihandine?

Mehmûd:

- Lê nepirse, got. Dema Xwedê dide meriv napirse, tenê dixwe!...

Paşê jî dema pîreka wî xwesti bû peran bijmêre, Mehmûd;

- Na! got. Min hejmartine, 300 hezar lîre ne!

Di vî karî de helbet yê ku fêda mezin kiri bû Girzo bû, lê evan ji bo Mehmûd jî ne perekî hindik bûn. Di jiyana xwe de, Mehmûd tu carî ne bû bû xwediyê xwe û ewqas pere û eger ne bi riyeke wisa ba jî ê ne bû ba... Xwediyê ewqas pere, li vî bajarî eger ne miroveki zengîn ba, feqîr jî ne dihat hesibandin. Lê Mehmûd ji wê şevê û vir de xwe nola zengînekî bajêr dihesiband. Zengînekî bajêr jî diva bû mîna zengînekî bijiya û wisa jî kir.

Xaniyê xwe ne guhert lê ji nû ve raxist. Digel ku ne pêwist bûn jî gelek tişt kirî bûn, evana zêdetir ji bo xemilandina malê bûn. Li gel van televizyoneke rengîn -tiştekî ku li malên zengînan jî kêm peyda dibû- kirî bû. Ji xwe famîlyê, kevnikên kincê xwe bi carekê avêti bû û teva kincên nû ji xwe re kirî bûn.

Êdî ji wê rojê û vir de Mehmûd zilamekî meşgûl bû û di

bazarên mezin de bû. Di demeke kurt de jî navê tucarekî mezin bi dû xwe xisti bû! Êdî li bajarê N. yên ku dixwestin xaniyên xwe, otomobîlên xwe, an jî dikanên xwe bifroşin, berê li Mehmûdê tucar digeriyan!

Mehmûdê ku pirî caran nizanî bû ê wexta xwe çawan bibo-rîne, nuha mecbûr dibû ku ji zemanê xwe yê kin re programekê çêbike! Wextê wî ewçend kin bû bû ku êdî hergav pê re ne digiha ku ji bajêr vegere malê, firavîn an şîva xwe li gel zarokên xwe bixwe û dîsa bi paş de vegere ser karê taciriyê û bazarên xwe! Lê xem ne dikir, perên Mehmûd hebûn û dikarî bû li bajêr, li aşxaneyekê jî xwarin bixwara. Merivekî nola wî, êdî ji vê saetê şûnde ê neçûya aşxaneyeke ji berê de, helbet! Çend roj şûnde Mehmûd li aşxaneya «Palaza Zêrîn» mêvanekî herwext bû. Ji xwarina wir zêdetir kêfa Mehmûd jê re dihat ku, dema şagirtan ew wekû; «Mehmûd Beg!» bi nav dikirin û xizmeta wî dikirin.

Di wexteke kin de, tucarî û ziyaretkirina cihên mîna «Palaza Zêrîn» gelek dostên nû jî ji Mehmûd re çêkiri bûn. Gelek karmend û karbidestên bajêr nasîna xwe dabûn Mehmûd. Di nav van dostên nû de, yên berbiçav, dadistên û komserê polîsan bû! Di vir de divê were gotin ku evana ji wî zêdetir, dostên perên wî bûn! Mehmûd jî qet xesîsî ne dikir, hergav ku li cihekî rûdiniştin wî ê beriya teva qewlikê xwe derxista û hesab bida. Lê dostaniyên wisa, li gel îmkanên nû, problemên nû jî bi xwe re dihanîn. Dîwar bi guh bûn û gotin digeriya!

Demeke tevlihev bû; guherînên sîyasî û civakî her roj li binguhê hev diketin û di van qezeyan de hercar bi dehan mirov dimirin, bi gotineke din dihatin kuştin! Partîya Gel dest

bi şerê çekdarî kiri bû û hercar di belavokên xwe de li dijminên xelkê, xayînên welêt geft dikirin. Lê hayê Mehmûd ji van guherînan tune bû û zêde bala wî jî ne dikişand. Ta ku rojekê dema herdu zarokên wan, serşikestî, bi girîn ji dibistanê vegeriya bûn malê! Bi rê de çend zarokên din keti bûn pêşiya wan, li wan xisti bûn û goti bûn ku; «Bavê we Tirşikçî ye!» Wê çaxê Mehmûd fam kir ku ev dostaniyên nû ê belena bînin serê wî!

Mehmûd biryar girt ku ji van têkiliyên nû xwe hinekî dûr bixe. Ji ber ku êdî perên wî jî kêm bû bûn. Lê çendî xwe li malê giran kir, riya xwe bi tu aşxaneyên mîna «Palaza Zêrîn» nema xist jî, dîsa gotinên li ser têkiliyên wî yên bi komsêr û dadistên re zêde dibûn û kêm ne dibûn! Heta carnan dema ku di kolanê re derbas dibû gotinên naxoş mîna; «Tirşikçî!» û «Caş!» dibihîstin. Ger ku li çend cihan Mehmûd xwesti bû xwe biparêze û ji xelkê re şirove bike ku şaş têgihiştine, rewşa wî ne wisa ye, lê kesekî baweriya xwe pê ne anî bû. Ji ber ku maldariya xwe ya ji nişka ve nikanî bû ji xelkê re eşkere bikira. Lê paşê Mehmûd fikirî ku divê çareyekê bibîne da navê xwe paqij bike. Ger ku ji xelkê re rewşa xwe nikanî ba şirove bikira, bi kêmanî dikanî bû eva ji Partiya Gel re eşkere bikira. Bi baweriya ku ewana ê wiya fam bikin xwest ku li gel Partiyê têkiliyê deyne.

Di vê nawbêne de Partiya Gel jî ranewesti bû; Mehmûd jî kiri bûn lîsteya xayînan û di derheqê wî de lêkolînên xwe kwîr kiri bûn! Ji xwe ev hewldanên wî yên dawîn ku dixwest li gel Partiyê têkiliyê deyne, weke xetereke mezin didîtin!

Şevekê xortekî nenas li deriyê malê xisti bû û xwesti bû ku

Mehmûd li gel wî here. Digel ku Mehmûd ew wexwandi bû hundur jî yê xort li ber deriyê hewşê, li reşayê li hêviya wî mabû. Mehmûd zûzûka kincên xwe li xwe kiri bûn û dabû pey yê xort, ji malê derketi bû.

Sê roj şûnde, li bajarê N'ê li bin pirekê, laşê zilamekî hati bû dîtin; bi derbekê, ji paş serê xwe hati bû kuştin. Li ser jî belavokek hebû: «Xayinê xelkê ji alî dadgeha xelkê ve hatiye cezakirin, bila eva ji bo xayînan mînakek be!» nivisî bû.

## TEYREK ZÊRÎN

Rojeke havînê î germ bû. Wê rojê O. piştî nîvro hinekî zû karê xwe qedandi bû û rast riya malê girti bû.

Roya ku ezmanê bê ewr î hêşîn ronahî dikir, bi tîrêjên xwe yên germ ve pîr û kal, keç û law ji hunduran dikişand derve û berên wan dida nav park, bexçe û peravan. Li vî welatê wisa sar, rojên wisa germ bi rastî jî ne erzan bûn. Dema ku bi dest jî diketin, xelkê welêt dizanî bûn ê çawa bi kar bînin. Hemû derdiketin seyrangehan, şahî dikirin û li peravan laşên xwe yên sipî li ber tîrêjên royê diqemirandin.

Lê O. yê ku bi eslê xwe ne rûniştevanê vî welatî bû, xwe biyanî hîs dikir û zêde beşdarî seyran û şahiyên xelkê welêt ne dibû. Digel ku çend caran hevalên wî yên kar, ew wexwan-

di bûn hin şahiyan jî, O. fam kiri bû ku ne li gor wî ne. Ji ber ku musilmaniya wî destûr ne dida ku ji goştê berêz bitamîne û tîna xwe jî bi şeraba sor bişikîne! Ger ku xwesti bû di van şahiyan de hinekî bireqise jî lê, li ber musîqa ku guhên wî cara pêşîn dibihîst, lingên wî bi ya wî ne kiri bûn! Loma jî beşdarbûyîna şahiyan betal kiri bû.

Carekê jî dema ku çû bû peravê, kincên xwe ji xwe kiri bû, xwe li ser destmala xwe dirêj kiri bû û xwesti bû mîna hemû kesan ew jî laşê xwe di bin tîrêjên royê de biqemirîne. Lê piştî demekê, komek zarokên meraqdar hati bûn li dorê kom bû bûn û xwesti bûn vî mehlûqatê bi laşê reş û pirça gelek, analîz bikin. Wê gavê wî, xwe mîna meymûnekî ku ji bexçeyekî heywanan reviyaye hîs kiri bû û loma jî kincên xwe li xwe kiri bûn û ji wir bi dûr keti bû. Ji wê rojê û vir de jî nema diçû ber peravan!

Îro jî mîna hercar riya malê girti bû. Lê dîsa wî dil hebû ku laşê xwe li ber rojê bigermîne. Ji ber ku balkona wî li aliyê roya piştnîvroyê diket û li wir bi rehetî dikanî bû evaya bikira.

Dema ku gihişti bû malê jî, wê gavê kincên xwe danî bûn; tenê derpiyekî sporê li xwe kiri bû, rahişti bû pirtûkekê û hewl dabû ku derbasî balkonê bibe. Lê wexta ku dikir deriyê balkonê veke, ji nişka ve rawestiya bû; tiştekî ku li ser maseya balkonê dibiriqî, bala wî kişandi bû. Pêşiyê got qey xwelîdanka tîtikî ye, lê gava ew tiştê tîtikî xwe livandi bû, ew di cihê xwe de behît ma bû û bawerî bi çavên xwe ne anî bû. Dev ji vekirina derî berda bû û dest pê kiri bû li vî tiştî temaşe dikir.

Teyrek bû, mîna kevokekê mezin bû. Lê tenê ji hêla mezinahiya xwe de li diruvê kevokê diçû...

O. tu carî teyrek wisa xweşik ne dîti bû. Na! Ne di ansîklopediyan de û ne jî di muzeyên çivîk û teyrikan de rastî teyrek wisa xweşik hati bû... tenê di çîrokên perîyan de saloxên teyrikên wisa bihisti bû. Teyrek wisa xweşik û çeleng tenê hunermendekî dikanî bû biafiranda û ew jî ne hemû hunermend, tenê yekî nola Hefaîstosê Yewnanî ku Xudayê hunermendiyê bû, dikanî bû heq ji tiştekî wisa derketa!

Periyên teyr mîna ku di ava zêr de bûbin dibiriqîn û li dorê şewqa taceke zêrîn çêdikirin. Nikilê teyr mîna yên kewan sor bû, lê sorekî tarîtir bû û lingên teyr jî mîna ku zivîn bûn diçirûsîn. Lê ji hemû tiştî zêdetir çavên teyr yên ku weke du stêrkan di ezmanekî tarî de diçurisîn bala wî kişandi bû û meraqa wî zêde kiri bû. Bêdeng û hîs, bi heyranî li sipehitiya teyr temaşe dikir û jê têr ne dibû. Çendî ku lê dinerî, teyr li ber çavên wî sipehîtir û heyraniya wî ya jê re jî zêdetir dibû. Awirên wî li ser teyr asê bû bûn.

Hinekî şûnde jî xebxeba teyr mîna dilekî piçûk lêdixist, teyr dest pê kiri bû dixwend. Lerzekê bi laşê O. girti bû, di cihê xwe de dicirifî. O. bi heyranî û evînî li vî dengê hindik ku ji paş deriyê girtî dibihîst, guhdarî dikir. Ev denga pê xerîb ne hati bû, mîna ku di dilê xwe de gelek caran bihîsti bû hîs dikir. Weke dengê sitraneke bêrîkirin û evînê dilşewat bû. Dengekî zirav, te digot qey ji viyolîneke perçeyekî musîqa Mozart der tê.

Paşê teyr dev ji xwendinê berda bû û li ser maseya balkonê doş dibû.

Di wê navbênê de jî O. difikirî, xwe bi xwe; «Nebe ku ev teyra birçî be û hinek zad dixwaze? got. An, dibe ku sitiriyek

keti be lingan û dixwaze ku ez wî sitiriyî derînim! An jî dibe ku teyrek kedî be û dixwaze bikeve paşila mirovekî!»

Wexta ku wisa fikirî, biryar da ku derî veke. Lê gava dikir ku derî veke pirsên din di serê wî de vêketin.

Xwe bi xwe; «Dibe ku qet jî ne birçî be û tu sitirî jî di lingan de tune bin» got. «Herweha dibe ku qet jî ne teyrek kedî ye û naxwaze bikeve paşila tu mirovan! Tenê, dibe ku refê xwe winda kiri be, westiyaye û dixwaze hinekî bîhna xwe berde, ji bo ku paşê bifire û dîsa bigihêje refê xwe.»

O. ji xofa ku ew ê teyr bitirsîne û eva ê wê gavê bifire, here bi riya xwe de, derî venekiri bû. Bi hindikayî ba jî dixwest ji xwe re kêliyekê lê temaşe bikira.

Hinekî şûnde teyr dest pê kiri bû, xwe ji ser maseyê çeng dikir, mîna ku dixwest derbasî hundur bibe xwe li pacê dida. Wê gavê jî O. ji bo ku keşif nebe û teyr netirsîne, daketi bû ser çogan, xwe li paş dîwêr veşarti bû. Lê piştî ku teyr xwe çend caran li pacê dabû, westiya bû û dûre rawestiya bû. Wê gavê O. dîsa rabû bû ser xwe û temaşekirina xwe ya teyr domandi bû. Piştî ku teyr hinekî din jî li ser maseyê doş bû bû, ji nişka ve baskên xwe vekiri bû û firiya bû. O. derî vekiri bû, baz dabû balkonê. Di wê bêhnkê de dixwest biba teyrek û li dû bifiriya; lê nikanî bû! Ji dêla vê ve bi dû de qêriya; «Neçe bi paş de were! Min têra xwe li te ne nerî!...» got. Lê teyr dûr keti bû, dengê wî ne dibihîst. Tenê çend ciranên wî ku li balkonên xwe rûnişti bûn qêrîna wî bihîsti bûn, ji hev re gotin; «Çi bi viya hatiye? Ev dîn bûye ku destên xwe ber bi ezmên vedike û diqîre!»

Belê O. dîn bû, sermest bû, ne li ser hişê xwe bû! Teyr fi-

riya bû lê mîna ku tiştek ji canê wî girti be û bi xwe re biri be, wisa êşek dijwar û şînek hîs dikir.

Dema ku behîtmayî li dû teyr dinerî, çavên wî ji hêsiran tijî bû bû. Teyr ber bi royê firiya bû û di çend saniyan de ji ber çavên wî winda bû bû. Lê ji hiş û fikra wî ne firiya bû! Bi şev û roj li bala wî bû. Dema ku radiket li xewna wî, dema ku hişyar bû jî li fikra wî bû. Hezkirin û bêrîkirina wî ya ji teyr her ku roj derbas dibûn, xurtir dibû.

Bi çend rojan şûnde jî, çû bû qefesek kirî bû, anî bû li balkona xwe dardekiri bû. Tasek av û tebsikek zad li balkonê danî û her roj nû dikir. Ji wê rojê û şûnde jî deriyê balkonê vekirî hişti bû. Gelek çivîk û teyr hati bûn hêlînên xwe di qefesê de çêkiri bûn, ji zad û avê xwari bûn, vexwari bûn û paşê jî bi riya xwe de firiya bûn û çû bûn. Lê teyrê zêrin ji wê rojê û şûnde qet xuyanî ne kiri bû û bi paş de ne hati bû.

## PIRTÛKÊN ME YÊN KU DERKETINE

**A. S. Pûşkîn* / KEÇA KAPÎTAN / *Roman*

* *A. P. Çêxov* / MIRINA KARMEND / *Novel*

* *Hesenê Metê* (nivîsende) / ARDÛ / *Ji çîrokên gelêrî*

* *Redwanê Alî* / TILÛRÊ BÊGANE / *Novel*

* *Hesenê Metê* / SMIRNOFF / *Novel*

* *Mûsa Anter* / HATIRALARIM / *Bîranîn*

* *Mehmed Uzun* / ROJEK JI ROJÊN EVDALÊ ZEYNIKÊ / *Roman*

* *M.F. Dostoyevskî* / MERIVÊN REBEN / *Roman*

* *Mehmed Uzun* / MIRINA EGÎDEKÎ / *Destan*

* *Hesenê Metê* / LABÎRENTA CINAN / *Novel*


* *Fawaz Husên* / SIWARÊN ÊŞÊ / *Novel*

**WEŞANÊN WELAT**

*Box: 41 23*

*141 04 Huddinge/ Sweden*

**WEŞANÊN WELAT**



*Herkes nîvsûcdar û nîvqurban e.*

**J.P. Sartre**